
# welat

Sal:3 Hejmar:110 27 Adar–2 Avrêl 1994 10.000TL (KDVD) **Rojnameya Hefteyî**


'Bipirsin min ji dîrokê min bibînin li şoreşê'

Rûpel 12



*Li hember îdîayên, "Emê an PKK'ê biqedînin an jî biqedînin" gelê Kurd jî bi yek dengekê li dijî zilm û zordariyê diqîre:*

# 'an SERKEFTIN an SERKEFTIN'




■ *Nayê nivîsandin, peyv hindik in, tu tarîf têrî nake, qels û jar dimînin hemû helbest. Gelo mirov çawa dikare şîrove bike wateya pêta van canên ciwan? Emê vê berxwedana ku di dîrokê de kesî hîna nedîtî û nebihîstî bi çi awayî bînin zimên? Ew tiliyên ku bi bedenên perîtî ve ne û bilind dibin, dibêjin, "An serkeftin an jî serkeftin" ji mirovahiyê re dixwazin çi bibêjin?*

■ *Kurd xwe dişewitînin, ew bi destê xwe agir li bedena xwe dixin, bi vîna xwe pêtê berdidin canê xwe. Alava agir bi ser serê wan ve bilind dibe, tiliyên wan di nav agir re dîsa bi ser agir dikevin û dibêjin, 'Serkeftin'. Dema agir bedena wan diperitîne û dibin xwelî, hingê giyana wan bi serfirazî bilind dibe û digihe navsera mirovahiya azad. Wê demê êdî ew dibin nemir.*

■ *Newroz di gel her tiştî dîsa hate pîrozkirin. Dîsa agirê wê bi gewdeyên mirovan hate geş û gurkirin. Li Almanyayê ji bo protestokirina zilma dewleta Alman û alîkariyên wê yên ji şerê qirêjî re 9 kesan xwe şewitandin. Li Mannheimê Nilgün Yıldırım (Bêrîwan) û Bedriye Taş (Ronahî) Newroz ronîtir kirin.*

Rûpel 8







# Hevaltî şîrîn e Erco

Ezê di vê nivîsara xwe de, hevalekî xwe yê 'zehf nêzîk bidime nasîn: Navê wî Ercan Başer e. Roja 12'ê Adarê 1994'an li Amedê şehîd ket. Ji aliyê kesên nenas (zehf nasîn) ve qetil bû." Berî ku ez wî bidime nasîn, ezê tiştekî bibêjim: "Xwezî şehîd neketa û min jî nenivîsiya!"

Me di nava xwe de jê re digot Erco! Ercan li Sêwazê Şaxa Muhendiziya Jeolojiyê qedand. Em bi hevûdu re sala yekemîn li Kampusê di eynî menzelê de bi hev re mabûn. Ercan kesekî zehf jîr bû, di demeke kurt de hawirdora xwe tev de naskir û hezkirina însanan di dilê wî de hebû... Qîz û xort hemû kesî jê hez dikir. Hew ev e, na!.

Di hundirê vê salê de ji bo serokatiya yurdê (Wargeha ku xwendekar lê radizên) berendamiya xwe danî. Ji bo berendamiya wî kesên welatparêz û çepên Tirkan hemûyan alîkarî danê. Lê wî ev hilbijartin bi 24 reyan windakir, lewre 200 xwendevanî rey ne avêtibûn. Karmendên yurdê gotin wext derbas bûye û nehiştin bi şexsîyeta Ercan kesên pêşverû, welatparêz û demokrat bi serkevîn. Ya din Ercan li Zanistgehê di sinifê de jî bi piranî reyên hevalê xwe standin û bû serokê sinifê jî. Nava wî û mamosteyên wî jî zehf xweş bû. Di çar salan de jeolojî qedand û bû endozyar.

Di sala 1991'ê de li Sêwazê Newroz li salonê hat pîroz kirin. Destûr ji walîtiyê hat standin. Komîteyek ava bû. Ji bo çalakiyên Newrozê Ercan ket koroya Muzîkê û me bi hev re destana Kawa, li gorî ku em fêr bûbûn me nivîsand û hevalan jî lîst. Yanî me kiribû skeç. Ji hingê û pêve Ercan bûbû hedefa dewletê. Kîjan hevalê ku li Zanîstgeha Komar a Sêwazê dixwend, bihata girtin di binçav de polîsan navê wî û yê du-sê hevalên wî dipirsîn. Heger ku, evê binçav bigota ez Ercan nasdikim barê her duyan jî giran dibû.

Hevaltî zehf şîrîn e. Gava ku hevaltî dibe rêhevaltî şîrîntir dibe. Me çar salan bi hev re Zanistgeh xwend. Tiştên xweş û nexweş di nava me re derbas bûn. Jiyan diyalektîk e heval, bi tiştên dijwarî tijî ye. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje, di jiyanê de tiştên xweş û nexweş cih digirin. Di vê pêvajoyê de em pir caran bi hev re keniyan û pir caran jî ji hev xeyidîn, an me dilê hevdu dişkand. Ev jî naziya jiyanê ye hevalê Erco.

Erco min tiştek dixwest; gava ku tu bûyî endozyarê jeolojiyê, min dixwest ez te bibînim, bes em ji hev dûr ketibûn, tu ketî gîrtîgehê lê dilê me bi hev re bû. Çaxê ku tu tahlîye bûyî min nebihîst, ezê bihatama ba te. Lê min di Rojnameya Gündemê, hejmara 16'ê Adarê de bihîst ku tu şehîd bûyî. Piştî vê bihîstinê ez bûme mîna dînên li nav kuçeyan! Heval ez jî zanim şehîdên welat hemû yek in. Lê dema mirov hev û du nasdike dilên însana tê guhertin. Erco em te ji bîr nakin û wê gelê Kurd tola te mîna hemû şehîdên welêt li erdê nehêle.

**Hevalê Erco**
**Şefaq ŞIVAN**

# Newroz agirê azadî û şerefê ye

Em wek di qonaxeke dîrokî de dijîn. Dîrokê, di gel têkoşînên ji bo azadîkirina mirovahiyê û serhildanan, şahidiyê ji êş û tehdeyên mezin re jî kiriye.

Doh zalimiya Dehakê xwînxwar li ser gelên Rojhilata Navîn bû, îro împeryalîst bi navê mêtingehkariyê, paşverûtiyê bi dilqên Dehakên nûjen, di serî de bi gelê me û bi gelên dinyayê xwîn didin vereşandin. Gel di vê doman û qonaxê de dîsa li dijî koledariyê, kedxwariyê û pêkutiyê dest avêtiye berxwedanê, serhildanê û têkoşînê. Ev têkoşîn ya azadbûna mirovahiyê ye.

Newroz agirê azadî û şerefê ye. Newroz, yekîtiya gelan e, ku di şer de, di têkoşînê de dibihure. Dostanî ye, wekhevîtî ye. Bi vê baweriyê em Newroza we hemûyan pîroz dikin, serkefitin a we be

**Dîlên PKK'ê yên li zîndana Entebê**

# Newroza gelê me pîroz be

Newroz, roja ronahiya pêtiyên agirê ku di şevên 21'ê Adarê de vêdikeve ye. Newroz, roja ku li hemberî Dehakên zalim, roja li hemberî zor û zilmê derketin e. Newroz, roja xofa tirsşikandin û hêviya biharê ye. Newroz, roja pora diyan hinekirin û hezkirina dilan e banga kilîlîla ye. Newroz, roja keçan e; ku di vê rojê de keç xweşik dibin, agir dikeve nava dilê wan, di nav bêhna nêrgiz û binevşan de bi coş dibin û li serê govendan, bi destmal serî dikişînin. Newroz, roja tîrêjên ku bi sê niftikan li zîndanan de vêdikeve û rohnî dibe. Agirê ku bi laşê Alkanê gûr bûye, Rahşana ku pêtî bi pêtî dişewite sosin e.

Newroz, roja mirovbûn, netewebûn û welatparêziyê ye. Newroz, gula ku ji devê namlûya çeka gerîla dertê, roja cejna azadiyê û dengê gelê me ye.

Newroz, cejna xebatkarên Welat, xwendevanên wê û ya gelê me yê welatparêz e. Ez cejna Welat, ku di her şertê jiyanê de ji bo gelê me dibe rêber, pîroz dikim û serkeftinê ji we re dixwazim.

Bi silavên dilxweşî...

**İskan AÇIKÇA**

# Newroza we pîroz be

Hevalên hêja ez ji xerîbiyê bi hesreta welat vê pîrozbahiyê ji we re dişînim; ku hûn di rojnameyê de biweşînin ezê kêfxweş bibim. Daxwaziya min hûn bi azadiyê şabin. Bimînin xweşiyê de.

*Xebatkarê Rojnameya Welat*
*Cejna we ya Newrozê*
*Bi Serokatiya Kawayê Hemdem*
*Mazlum Doğan ve pîroz dikim...!*

**WELATA MIN**

Ew birhê te yî reş
Ew çavê te yî reş
Ew ekla te yî xweş
Ez şewitandim bextê te
yî reş..!

**Qehremanê ELIHÎ**

# *Silavên germ ji Sofyayê*

Ez silavên germ, bi hezaran bi milyonan silavên germ, bi navê pîrekên welatparêz ên Kurd ku li Sofyayê dijîn, ji xwediyê fikrên bi milyonan, ji Serokê Kurdistanê re, ji şoreşgerên serê çiyan û yên li zîndanan re dişînim. Em soz didin, em li ku derê bin, dev ji berxwedanê bernadin.

*Li ser navê jinên Kurd ên welatparêz yên li Sofyayê*
**RÛKEN**

**Em cejna we ya Newrozê pîroz dikin û di têkoşîna we de serkeftinê hêvî dikin**
***Dîlên welatparêz ên şoreşger yên ji zîndana Sağmalcılar'ê***

# Nivîsara Welat

## Li ser zimanê nivîskî çend gotin

Karê me Kurdan gelek e, barê me pir giran e û em di pêvajoyeke zehf hesas de ne. Ji niha ve gavên ku em çewt û ne li cih diavêjin, di rojên li pêş de wê serêşiyên pir mezin ji me re çêbikin. Di warê afirandina saziyên çandî û hunerî de pêwist e ku em bêpîvan û bêrêzik ji cihê xwe nelivin. Divê hemû xebatên me bi bernameyên birêkûpêk û metodên zanistî bimeşin. Nexasim (bi taybetî) îro zimanê Kurdî wek warê hesastirîn derdikeve pêşiya me. Her çendî zimanê Kurdî yê devkî, di pêvajoya sedan salan de, ji ber nebûna yekîtiya Kurdan û saziyên wan ên yekgirtî, li gor herêman guherîbe û cihêrengiyên mezin di navbera devokên Kurdî de çêbûbin jî, derfeta pêkanîna zimanekî nivîskî yê hevpar û yekgirtî ji holê ranebûye, bi serwextî û metodên zanistî di vî warî de serkeftin mumkun e. Di pêkanîna vî zimanê hevpar de ji xwe ji mêj ve Celadet Bedîrxan gavên bingehîn avêtine û em di berdewamkirina vî karî de jî Rojnameya Welat xwedî gotin û rist dinirxînin.

> ***Em nirx û rûmeteke gelek mezin didine xebatên hemû kesên ku li ser zimanê Kurdî serê xwe diêşînin, tevî vê yekê em wan kesan vedixwînin ku hinekî din bi baldarî û baştir Celadet Bedirxan bixwînin da ku ji giringiya xebatên wî yên li ser zimên têbigihin.***

Mixabin, tevî zarûriyeta xebatên zanistî, hîna ji vê gavê ve Kurdên eleqedarên zimên û saziyên Kurdî gavên pir çewt û şexsî diavêjin. Mesela îro hejmara kovar, rojname û saziyên Kurdî li welêt û derveyê welêt gihane dora sedî. Hin ji van xebatên xwe xwerû bi Kurdî, hin ji wan jî (bi piranî) nîvî bi Kurdî nîvî jî bi Tirkî, Erebî û zîmanên din dimeşînin. Em dikarin bibêjin ku zehfê van saziyan li gor dilê xwe zimanê Kurdî bi rastnivîsên "ucûbe" bi kar tînin.

Em dibêjin mafê tu kesî tune li gor kêfa xwe bi zimanê Kurdî yê nivîskî bilîze, rêzik û qeydeyên heyî xerabike û bi tena serê xwe rêzik û qeydeyên "nû" bixe nav rêzimana Kurdî û rastnivîsa Kurdî ya latînî.

Her çiqas di navbera devokên Kurdî de hin cihêrengiyên herêmî hebin jî, zimanekî Kurdî yê yekgirtî di warê nivîskî de, ji berê ve hatiye pejirandin, rêzikên wî yên rêzimanî û rastnivîsî jî, ji aliyê mamosteyê mezin Celadet Bedirxan û hevalên wî ve hatine tesbîtkirin û şirovekirin. Helbet em qeydeyên ku Celadet Bedirxan pêşkêşî me kirine, hemûyan wek yên mutleq û najêger nabînin, bes bi giştî ta ku tevlîhevî û cihêrengiyên di navbera devokên Kurdî de hene, neyên çareserkirin û ji holê ranebin, emê restnivîs û rêzimana Celadet, heta ji destê me were, biparêzin.

Em nirx û rûmeteke gelek mezin didine xebatên hemû kesên ku li ser zimanê Kurdî serê xwe diêşînin, tevî vê yekê em wan kesan vedixwînin ku hinekî din bi baldarî û baştir Celadet Bedirxan bixwînin û ji giringiya xebatên wî yên li ser zimên têbigihin (fêm bikin).

Weke ku me li jor jî anî zimên, em wek rojnameya Welat xwe xwedî gotin dibînin di gengeşî û biryarên ku li ser zimanê Kurdî tên pêkanîn de û dixwazin rê li ber çewtiyên di vê hêlê de tên kirin, bigirin. Em Celadet Bedirxan jî mîna pisporê zimanê Kurdî dipejirînin û bi giştî dixwazin di vî warî de riya ku wî ji me re vekiriye bişopîrin, biparêzin û hin jî firehtir bikin. Bêguman, Mîr Celadet ji bo me ne senem (pût) ek e, lê dîtina me ew e ku îro jî wî pîsportir kes derneketiye di warê zanîna zimanê Kurdî de û kesî bi qasê wî xebatên zanistî li ser vî zimanî pêkneanîne. Ji ber vê yekê, pêwist e, bi taybetî jî di pêvajoya girîng û hesas de, hemû sazî û weşanên Kurdî yên ku bi alfabeya latînî derdikevin, li gor rêziman û rênivîsa Celadet binivîsin.

Gelo wek rojnameya Welat, em çiqas rêzikên Celadet dişopînin, hefteya pêşiya me li ser vê yekê jî çend gotinên me wê hebin. Bimînin di xweşiyê de.

**Mazhar Günbat**

*Ji ber problemên ku li Tirkiyeyê roj bi roj zêde dikin*

## Şûraya leşkerî bi derengî civiya

Li Tirkiyeyê Şûraya leşkerî, di 18'ê Adarê de civînek awarte çêkir. Li gorî bernameya civînê Serokwezîr Tansu Çiller beşdarî civînê nedibû, lê Çiller beşdar bû û ji bo daxwazên leşkerî ev gotin: "Ez soz didim ku ji destê me çi bê, wê bête kirin." Bi kurtahî di civînê de biryarên ku tawsiyeyî hikûmetê bûne ev in: Lazimiya leşkerî ya wasite, malzeme û pereyên ku ji bo karên taybetî bête amadekirin. Weşanên ku di çapemeniyê de dertên pêwist e ku leşkeriyê an jî personelên leşkerî (komutan û serbaz) bi awayekî ne xweş nekin hedef. Ji bilî vê, divê ku propagandeyeke baş di der heqê leşkeriyê de bê çêkirin. Di civînê de li ser têkiliyên Tirkiyeyê û dewletên cîran jî hate rawestandin û daxwaza têkiliyên baş û germ hate xwestin. Civîn, hewce bû ku di meha Reşemiyê de bihata çêkirin, lê ji ber muafiyeta mebûsên DEP'ê ev tarîx, hate guherandin û piştî hildana muafiyetê hate çêkirin. Armanca civînê hem piştî rakirina muafiyeta mebûsan, hem berî cejna Newrozê û hilbijartinan, tedbîrên ku wê bê standin û hem jî ji bo biryarên nû jî nirxandinek bû. Di civînê de li ser meseleya DEP'ê jî bi vî awayî biryar hate wergirtin: "Di nav meclîsê de û li derveyî meclîsê, hewceye ku rê li ber partiyên cûdaxwaz bête girtin." Ev biryar, wek tê xuyakirin, ji bo Partiya Demokrasiyê hatiye standin.

## Kampanyaya DEP'ê

Li Stenbolê û İzmirê Partiya Demokrasiyê kampanyayeke greva birçîbûnê da destpêkirin. Greva ku li DEP'a Bahçelievler, Ümraniye û DEP'a bajarê İzmirê ji aliyê rêveber, endam û dostên gelê Kurd dest pê kir, wê bi dorvegerî bidome. Pêşî, roja 25'ê Adarê, nêzîkî 50 kes li DEP'a Bahçelievler beşdarî grevê bûn, dora rojê jî li DEP'a Ümraniye û İzmirê grevê dest pê kir. Li gor daxuyaniya DEP'ê, greva birçîbûnê li dijî her cure êrîş û pêkutiyên dewleta Tirk, pêşî li Stenbolê dest pê kiriye û di rojên pêşiya me de wê li bajarên din jî berê grevê fireh bibe.

# Almanyayê Newroz qedexe kir


Roja 21.03. 1994'an mîna her sal penaberên Kurd ên li Almanyayê; mêr, jin, zarok û zêç bi kincên xwe yên neteweyî derketin kolanên bajaran. Li her cihî bi rêdana dewleta Alman standibûn ji bo ku cejna xwe pîroz bikin. Dixwestin bi şahî, bi dahol û zurneyan vê rojê derbas bikin. Lê polîsên Almanî ev kêf di dilê wan de hesret hişt. Bi dar, jop û kûçikan êrîş anîn ser gel. Digotin Newroz qedexe ye. Li hember vê helwestê gel, li ber xwe da. Li Berlînê xwe benzîn kirin û agir berdan xwe. Polîsan jî lê temaşe dikirin. Pir mirov jî hatin girtin. Li Hannover (60) kes hatin girtin û bi dehan birîndan bûn. Li gelek bajarên Almaniyayê bi sedan hatin girtin û birîndar ketin.

Li hember helwesta dewleta Alman, di roja 22.03.1994'an de gelê Kurd li Almanyayê bi livbaziyeke protestoyî rabû. Bi hezaran ketin otobanan û rê xitimandin. Li nêzî Frankfurt A.5'ê rê hat birîn, du kesan xwe benzîn kirin û agir berdan xwe. Bi dijwarî birîndar bûn û ew rakirin nexweşxaneyê. Ji 70 kes jî bêhtir hat girtin û bi dehan birîndar bûn Li nêzî Bremenê dîsa rê birîn. Bi dehan birîndar û zêdeyî ji sed kesî hatin girtin. Li Hamburg, Köln, Berlîn û li hemû bajarên mezin ên Almanyayê riyên bingehîn hatin birîn. Li her cihî jî polîs bi hovîtî diçûn ser gel. Bi saetan çûn û hatin di riyên Almanyayê de hatin rawestandin.

Niha Şahyarê (Wezîrê) Karê Hundirîn Manfred Kanther û serok şahyar H.Kohl alîkariya dadgehê dixwazin ji bo ku protestovanên Kurd gunehbar bikin û wan bispêrin dewleta Tirk.

Dewleta Alman mîna her car dîsa li hember mafê gelê Kurd yê mirovahî dijminahiya xwe eşkere kir. Vê carê ne bi alîkariyeke dizî, raste rast li hember gelê Kurd radiweste. Dixwaze bi sedan kesên bêguneh bi mirinê tewabar bike. Kesên girtî mafên penaberiyê li gora qanûnê Almanî standine. Dewleta Almanî baş jî dizane dema bispêre KT'ê mirin li hêviya wan e. Vê mirinê dewleta Alman ji bo wan dibire, ne Tirkiye.

Dîmenek ku min bi çavan dît ev e: Li Hannover polîsan ji gel xwest ku vegerin malên xwe lewre ku Newroz qedexe ye. Piştî dîlan, şahî û dirûşmeyên neteweyî gel dixwest belav bibe, lê bi hezaran polîsan dora wan çeber kirin û nehiştin kes here mal. Ev jî bû sedema derketina şer di nav polîs û Kurdan de. Komeke ji 60 kesî pêkhatî ji aliyê zêdetir 100 polîsî ve hate dopêçkirin. Bi dar û pehînan li wan dixistin heta ku tev bêhiş diketin. Piraniya wan bi dijwarî birîndar bûn. Lê nedihiştin ku erebeyên nexweşxaneyê wan rakin.


*Polîsên Alman wezîfeya hêzên dewleta Tirk li Almanyayê pêk anîn.*

Kesê ku dihat girtin serê wî didanin ser çimentoyê û bi pehîn û daran lê dixistin. Li gorî agahiyên ku me standin li her cihî bi vê hovîtiyê diçûn ser gel. Ji ber vê yekê texmîn heye ku gelek jî lêdan û îsekenceya şehîd bikevin.

**Selim BIÇÛK**

# Li Gazînoya Çakilê Newroz pîroz kirin

Di 21'ê Adarê de li Stenbolê li Gazînoya Çakilê Weqfa Maf û Azadiyên Kurd, şeveke Newrozê çêkir. Şev du saet bi derengî dest pê kir. Serokê Weqfê û wezîrê berê Şerafettin Elçi, di destpêkirina şevê de axivî û li ser pirsgirêka Kurd bi kurtahî sekinî. Li gorî Şerafettin Elçi dewleta Tirkiyeyê, ev 70 sale ku li hemberî gelê Kurd pest û pêkutiyan diajo û tu carî ji bo diyalogekê rê li gelê Kurd venekiriye.

Piştî axaftina Şerafettin Elçi şev bi Koma Dîlanê ya Bilîsê ve dest pê kir. Ji şevê re gelek mesaj, hem ji nav Tirkiyeyê û hem jî ji derveyî Tirkiyeyê hatin. Di nav sazî û kesên ku bi mesajên xwe beşdarî şevê bûbûn, wek Serokê Enstîtûya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan, Komkar, Serokê PDK'ê Hemreş Reşo, Yekbûn, Navenda Çanda Kurdî û hewd. ji bilî van gelek kesên din jî beşdar bûbûn, wek Fatoş Güney, Ercan Karakaş (Mebûsê SHP), neviyê Şêx Seîd Kasım Fırat, Hüsnü Okçuoğlu (mebûsê berê), Zafer Üskül (Berendamê Navçeya Bakirköy yê SHP'ê) Nadîr Aras (Berendamê Navçeya Emînönü yê SHP'ê), Esat Canan (Mebûsê Hekarî yê SHP'ê), rojnamevan Ahmet Altan.

Di şevê de komên muzîkê û stranbêj jî hebûn. Koma Serora Nat, Kulîlkê Medya, Koma Dengê Azadî, Eskerê Cizîrî û Ferhat Tunç. Li dorî 4000 kes beşdarî pîrozkirinê bûbûn.

**Siûd AZAD**



### Ercan Başer (1968–...)

Hevalê hêja, carinan bedelê azadiyê mirin e. Te ev baş dizanîbû, lê dîsa jî lazim bû tu bi tenê neçûbûyayî nav dijmin. Bawer bike ne wextê mirina te bû. Tuyê wek pakrawanê welatê xwe di dîrokê de cih bistînî. Em te ji bîr nakin û dev ji doza te bernadin.

*Li ser navê hevalên te yên Zîndana Elezîzê*
***Mele RESUL***


*Li Stenbolê der û dorên Weqfa Maf û Azadiyên Kurdan Newroz li Gazînoya Çakilê pîroz kirin.*

### *Neo–Naziyekî berê, ku niha dev ji faşîstiyê berdaye Ingo Hasselbach:*

# 'Ji hev cuda dimeşin lê tev bi hev re êrîş dikin'

Ingo Hasselbach, serokekekî navdar ê Neo–Naziyên Almanyayê bû. Hasselbach niha 26 salî ye, ew piştî ku di sala 1987'an de ji girtîgeha Almanyaya Rojhilat hate berdan tevî tevgera serûtên Berlîna Rojhilat bû. Piştî hilweşîna Dîwarê Berlînê (1989) Hasselbach rêxistina rastgir a bi navê Alternatîfa Neteweyî ava kir. 800 endamên vê rêxistinê hebûn û ew rêxistin di sala 1991'an de li Almanyayê hate qedexekirin.

Hasselbach piştî hinek êrîşên ku Neo–Naziyan li dijî biyaniyan pêk anîn, dev ji rêxistina xwe berda. Kovara Newsweek'ê bi Hasselbach re li ser çalakiyên wî yên berê û keftûlefta Neo–Naziyan hevpiyvînek çêkir, Hasselbach der heqê xebatên Neo–faşîstan de agahiyên balkêş dide, em vê hevpeyvînê werdigerînin û pêşkêşî xwendevanên Welat dikin.

*Hûn ji bo çi bûn Neo–Nazî?*

– Bûyîna mirovekî Neo–Nazîst ji bo min, riya nîşandana berteka (reaksiyon) xwe ya dijraberiyê li hemberî rejîma GDR'ê (Almanyaya Rojhilat) bû. Min gelek salên xwe di girtîgehê de derbas kir û min ev rejîma (li gorî gotina wan) antî–faşîst ji aliyekî din ve nas kir. Dema ez tenê dijraberekî GRD'ê bûm, ez ne aligîrê tu bîrdozan (îdeolojî) bûm, piştre ez bûm Neo–Nazî. Ez demekê li dohêla hippî û punkan geriyam, lê wan tenê dijraberiya bi dev dikirin, ev jî ji bo min ne bes bû. Min guherînên radîkal dixwestin.

*Hûn pir zû gihîştin radeyeke bilind, di nav tevgera Neo–Naziyan de...*

– Navdarbûna min a ku tê gotin li dû hilweşîna GRD'ê hat. Ez vê demê bi Neo–Naziyên rojavayê Almanyayê (Micheal Kühnen û Christian-Worch re ketim têkiliyê, alîkarî û piştgiriya ku ji mêj ve ez lê digerim, min bi dest xist. Fikra "sosyalîzma neteweyî", xebitîna ji bo başiya gel û gelek tiştên ku di serdema Naziyan de (1933–1939) li Almanya hebû, wek rewşa aborî ya baş, ji bo her kesî kar û refaha cîvakî heyecan dida min. Gelekên me jî di bin bandora tawanbarên şerê duyemîn, yên di girtîgehê de man (lewma bûn Neo–Nazîst).

*Hilweşîna Dîwarê Berlînê çi guherîn di çalakiyên we yên polîtîk de çêkirin?*

*Têkiliyên wan bi her dewleta Ewrûpayî re hene. Li Kanadayê hinek komikên li dor Ernst Zûndel civiyane (ev zilam ji bo înkarkirina qetlîaman û revîziyonîzmê pir girîng e), Partiya Nazî ya Amerîkayê ku li Lincoln û Nebraskayê ye ji ber ku dikare hemû çalakiyên xwe bi awayekî vekirî bimeşîne û hemû materiyal li wir tên dîtin, risteke girîng hildaye ser milê xwe.*



Ingo Hasselbach

– Bi alîkariya têkiliyên ku me bi Rojavahiyan re danîn, cara yekemîn me li GDR'ê partiyek rastgir ava kir. Riya avakirina platforma partiyekê wan bi ber me xist (nîşanî me dan), tiştên wek materiyalên propagandayê, toreya hêvojkariyê dan me. Me di gel partiyên Nazîst yên Amerîka, Danîmarka, Îspanya û Holandayê civîn li dar xistin.

*We tu êrîş organîze kirin?*

– Bi xwezayî hinek êrîş çêbûn. Çend cerdên me li ser rawestgehên trenê yên li Lichteburg'ê çêbûn. Me bi van êrîşan mitrib û penaberên ku ev der ji xwe re wek civîngeh ecibandibûn ji wir dûr xistin. Hinek êrîşên me jî li dijî Atonomîstan (Çepgirên Almanî), li dijî cih û warên penaberan çêdibûn. Dîsa me perwerdebûna şerê çekdarî organîze dikir, wek perwerdehiya mirov kuştinê û narîncok an.

*We çek çawa ( ji ku) bi dest dixistin?*

– Piranî ji Rûsan, vekişîna wan ew qas bêrêxistin bû ku, bidestxistina çekan pir hêsan bû. Hem jî bi bihayê gelek nizim me çekên wek, bazuka, narîncokên destan û keleşnikof bi dest dixistin.

*Naziyan bi milyonan mirov kuştin û kirin ku Almanya parçebûyî bimîne. Tiştê we dixwest ev bû?*

– Auschwitz mijara ku Neo–Nazî qet li ser ne diaxivîn bû, li gorî wan tiştekî wisa nîn bû. Me (ji dîroka Naziyan) tiştê me dixwest hildibijartin wek rewşa baş a Reich a sêyemîn. Me ji bo şerê duyemîn jî Almanya berpirsiyar nedidît, lê Polonya, Îngîltere û Fransayê ew bêgav hiştibû ku têkeve şer.

*Ji bo çi piştî şeş salan hûn ji tevgera Neo–Naziyan veqetiyan?*

– Ji bo min bûyerên wek Rostock, Hûnxe û Möln'ê, navçeyên ku lê êrîşên Neo–Naziyan yên herî xerab pêk hatin kirin ku ez biryareke bi vî rengî bidim. Min dît ku wê mirov bên kuştin û tiştên pêk tên em nikarin kontrol bikin. Tiştên ku dibûn ez şoke kirim û wê jî rê da ku cin ji şûşê derê.

*Li hemberî veqetîna te wan çi reaksiyon nîşan da?*

– Piştî ku mi biryara xwe da ez çûm Parîsê, ji lew re wan berê xwe dan malbata min, avahiya dayîka min hate rûxandin, êrîş birin ser xweha min. Tiştê herî bi xetere vê (Mijdar) Sermaweza çûyî pêk hat, ji dayika min re nameyeke ku tê de narîncok (bombe) hebû şandin. Niha diya min di bin parêziya polîsan de ye. Ez jî pir kêm têm Berlînê û tim li derve me.

*Neo–Nazî çawa bi rêxistin bûne?*

– Taktîka wan, ji hev cuda bimeşin, lê bi hev re êrîş bikin. Ji der ve dixwazin wek bêrêxistin û parçebûyî bên dîtin. Ji aliyê seretayan (prensîb) ve hemû rêxistinên ji hev cuda, tev dixebitin. Ev jî bi alîkarî ya telefonên mobîl û kompîturê dibe. Niha li seranserî Almanyayê networkek hatiye avakirin. Polîs dizane çi dibe, lê li hemberî vê ragihandina nûjen nikare tiştekî bike.

*Neo–Naziyên Almanî, bi tevgerên li derveyî Almanyayê yên bi vî rengî re jî têkiliyan datînin?*

–Têkiliyên wan bi her dewleta Ewrûpayî re hene. Li Kanadayê hinek komikên li dor Ernst Zûndel civiyane (ev zilam ji bo înkarkirina qetlîaman û revîziyonîzmê pir girîng e), Partiya Nazî ya Amerîkayê ku li Lincoln û Nebraskayê ye ji ber ku dikare hemû çalakiyên xwe bi awayekî vekirî bimeşîne û hemû materiyal li wir tên dîtin, risteke girîng hildaye ser milê xwe.

Li Yugoslaviyaya kevin hinek rêxistinên rastgir hene û di nav şerê hundirîn de cih girtine. Bi networkê (Neo–Nazî) xwe digihînin hemû derên Rûsyayê, armanca vê xebatê Ewrûpayeke neteweyî ye.

## Li El Salvadorê hilbijartin

Piştî çekdanîna gerîlayê FMLN'ê (Eniya Rizgariyê ya Farabundo Martî), roja 20'ê Adarê li El–Salvadorê hilbijartin çêbû, li gorî encamên ne fermî, partiya desthilatdar a rastgir (Hevkariya Komarî ya Neteweperest) bi ser ketiye. Vê partiyê piçekî ji sedî 50 zêdetir ray standine. FMLN'e ji %26 ray standine. Ji bo bi destxistina serokkomariyê %50 ray pêwist e.

Wek tê zanîn 15 meh berî vê 8000 gerîlayên FMLN'ê çekên xwe danîbûn, dawî li şerê hundirîn hatibû, lê gelek endamên FMLN'ê ji aliyê hêzên tarî ve hatibûn kuştin. Berendamê FMLN'ê ji bo serokkomariyê Ruben Zamora rexne li hikûmetê girt û daxuyand ku % 12 mirovên hilbijêr, ji ber ku navê wan di listeyên hilbijartinê de derneketiye, nikaribûne beşdarî hilbijartinê bibin. Zamora dîsa jî diyar kir ku ji encamê ne dilsar in.

Di vê hilbijartinê de ji serokkomar, cîgirê serokkomar, 84 endamên parlementoyê û 262 serokatiyên belediyeyê re 2.4 milyon kesî dengê xwe dan.

# Li Fransayê xwendekaran serî hilda

**Nûçeyên Derve–** Bi hezaran xwendekar li dijî qanûnê hikûmetê ya der mafê miziyê (ucret) roja 22'ê Adarê bi livbaziyên protestoyî serî rakirin.

Li gorî vî qanûnî kesên ku nû dest bi kar dikin, divê ji miziya asgarî ji sedî 20 kêmtir pereyan bistînin.

Li gelek bajarên Fransayê xwendekaran protestoyên ji hev cuda li dar xistin. Li Lyonê di nava hefteyekê de çar rojan li ser hev xwepêşdan û meş li dar kexistin. Li Parîsê 50 xwendekarî rawestgehek vegirt, nehişt ku trên rabe. Li gelek deverên din jî livbaziyên bi vî rengî çêbûn.

6 hezar kes beşdarî meşa li Lyonê bûn. Li vir xwendekaran camê dikanan şikênandin, erebe şewitandin. Tê gotin ku gelek mirov birîndar bûne û 40 kes jî hatine girtin. Îsal li Fransayê grev û protestoyên mirovên ji çîn û refên cihêreng rayedarên dewletê kir nav tengasiyeke berbiçav. Pêşî greva karkerên balefirgehan, pişt re livbaziyên cotkar û masîvanan, niha jî xwendekar. Giş ji ber sedemên ekonomîk çêdibin. Niha li hemû welatên Ewrûpayê hejmara bêkaran her ku diçe zêdetir dibe. Ev jî rê li ber qanûnên li dijî mafê mirovên kedkar vedike. Li Fransayê rêjeya (nîspeta) bêkaran ji sedî 12 ye. Tevgera xwendekaran livbaziyên 68'an tîne bîra mirov, lê tê gotin ku rewşa îro ji ya wê demê xerabtir e û ev jî van livbaziyan ji bo sîstemê hîn bi xetere dike.



*Xwendekarên li Fransayê wek hevalên xwe yên 68'an ji bo mafên xwe serî hildan*

# Li İzmirê pîrozbahiya Newrozê çêbû

Li İzmirê êvara 19'ê Adarê li "Ekici Över Aile Çay Bahçesi'yê bi beşdarbûna zêdetirî 7000 kesî Cejna Newrozê hate pîrozkirin. Pîrozbahiyê wek her car bi rawestina li ser piya ji bo giramgiriya giyana şehîdên Kurdistanê, dest pê kir. Li dû wê, mesaj hatin xwendin.

Piştî mesajan Koma Folklorê ya NÇM'ê bi govendên ji aliyê Amedê û Arya Folklor bi govendên ji aliyê Semsûrê beşdarî pîrozbahiyê bûn. Kom û kesên stranbêj jî bi piranî ji NÇM'ê bûn. **Gulên Mezrabotan, Arjîn, Koma Öncü (pêşeng)** bi stranên xwe pîrozbahî geş kirin. Şanoya Jiyana Nû jî lîstikeke li ser Newrozê pêşkêş kir. Koma Çiya ji ber ku wext dereng bû derneket.

Di pîrozbahiyê de ji mebûsên DEP'ê Zübeyir Aydar û Serokê DEP'a İzmir'ê Hikmet Fidan peyivîn. Piştî axaftina wan, mesajên ku hatibûn, hatin xwendin.

**Sîrwan REŞÎD**



*Newroza 94'an jî, weke her sal li her derê Kurdistanê bi coş hate pîrozkirin*

# Kê dostê Kurdan Georgiadis kuşt?

**Navenda Nûçeyan–** Serokê Komîteya Piştgiriya Kurdistanê û Serokê Daîreya Agahdariya Rûm Theofilos Georgiadis ji aliyê du êrîşkeran ve hate kuştin. Bûyer li Lefkoşeyê di 20'ê Adarê de li ber mala Georgîadîs qewimî. Gelek partî û derdorên siyasî ji kuştina Georgiadis **MÎT** hate berpirsiyar girtin.

Theofilos Georgiadis wek dostê Kurd dihat naskirin û gelek caran ji aliyê çapemeniya Tirk ve wek hedef hatibû nîşandan. Li ser kuştina Georgîadîs televîzyonên Yewnanîstan bernameyên xwe guhertin. TV'an bernameyên li ser jiyanan wî weşandin. Gel jî kuştin bi awayekî girseyî protesto kir.

Nûnerîtiya **ERNK**'ê ya Ewrûpayê jî li ser kuştina Theofilos Georgiadis daxuyaniyek da û Mît'ê berpirsiyar girt. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin: "Di meha Rêbendana vê salê de jî li Danîmarkayê Serokê Komîteya Kurdistanê İmdad Yılmaz, bi bûyereke wiha hate birîndarkirin. Cinayetên bi vî cureyî êdî rûyê terorîst ê Tirkiyeyê derdixe ronahiyê. Divê bersiv ji Tirkiyeyê re bê dayîn ku bi awayên Moxol û Osmaniyan ve gundên gelê Kurd hildiweşîne û dişewitîne û bi çekên giran ve êrîş dibe ser wan. Em Georgiadis hem wek dostekî hêja yê gelê xwe dibînin û hem jî bi xizmetên wî wek mensûbekî ERNK'ê dibînin. Belê mensûbê eniya me ERNK'ê bû. Em li pêşiya rûmetdariya riya wî bi giranî xwe ditewînin, ji malbat û gelê Qibris û Yewnanîstanê re serxweşbûnê dixwazin."



*Theofilos Georgiades*

Derdorên siyasî jî, bi daxuyaniyên xwe ve derbiriyan ku dewleta Tirk ev cinayet kiriye û diyar kirin ku Tirkiyeyê terorê îhracî Qibris kiriye. **Partiya Bihara Siyasî, Partiya Çepên Hevgirtî, Partiya Komunîstên Yewnanîstanê, Komeleya Pontûsê, Daîreya Agahdariya Rûm** tev ji kuştina Georgiadis MÎT'a Tirk berpirsiyar girtin.

Li paytexta Yewnanîstanê Atînayê serokên 8 belediyan civîneke hevpar li dar xistin û ji kuştina Serokê Komîteya Piştgiriya Kurdistanê û Daîreya Agahdariya RûmThefilos Georgiadis hikûmeta Tirk sûcdar kirin. Di civîne de bal kişandin ser kirinên dewleta Tirk ên li Kurdistanê jî û gotin ku wê bi awayî eşkere alîkariyê bidine tevgera rizgariya gelê Kurdistanê.

Serokê Komîteya Piştgiriya Kurdistanê Theofilos Georgiadis ku bi pênc guleyan ve hatibû kuştin, Roja 22'yê Adarê, bi beşdariyeke mezin ve ku darbets bi alên Rûm û ERNK'ê ve xemilandîbû hate veşartin. Georgiadis bavê sê zarokan û 37 salî bû.

## *Metodên Tirkiyeyê ne bi dilê Amerîka ne*

**Navenda Nûçeyan–** Hevalbendên Tirkiyeyê, nerazîbûna xwe ya li ser hildana muafiyeta parlementerên Kurd û girtina wan hêdî hêdî didine der. Piştî dewletên Ewrûpî, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) jî bertekiya xwe dide nîşan û pê dike ser Tirkiyeyê ku meseleya Kurd bi riyên siyasî û aborî hel bike. Heta di Kongreya DYA'yê de tê axaftin ku ambargoyeke qismî wê bê pêkanîn.

Nêzîkbûna DYA'yê ya ber bi meseleya Kurd ve rayedarên Tirk ditirsîne. Endîşeya Komara Tirk ew e ku li hemberî têkoşîna Kurdan a azadîxwaz bi serê xwe tenê bimîne. Ji aliyê din ve, li gorî nivîskarê **The Tîmes'ê Mîcheale Bînyon**, NATO û hevalbendên wê di amadekariya protestokirina Tirkiyeyê de ne, ji ber girtina parlementerên DEP'ê.

Tê ragihandin ku di Kongreya DYA'yê de li ser qewmînên li Tirkiyeyê axaftin çêbûne û Cîgirê Wezîrê Karê Derveyî yê Amerîkayê **Stephan Oxman** ku di 9'ê Adarê de serdan li Tirkiyeyê kiribû, agahdarî daye rayedarên Kongreyê û pirsên wan bersivandiye. Hate hînbûn ku Serokê Komîteya Rajêra Karên Derveyî ya Civata Nûneran **Lee Hemîlton** kêfnexweşiya xwe ya der heqê mebûsan de derbiriyaye û ji Oxman daxuyanî xwestine. Awayê ku **Samî Kohen** di quncikê xwe de nivîsand (rojnameya Mîlliyet) Stephan Oxman ev bersiv daye Lee Hemilton: **"Em li dijî PKK'ê diavêjin pişta Tirkiyeyê, lê di her keysê de me çareyeke ne leşkerî parast. Hîn jî tiştên ku Tirkiye bike gelek in. Em wek hevalbendek rûmetê didine Tirkiyeyê, lê em dibêjin ku ev mesele bi tenê bi riya leşkerî hel nabe jî. Mixabin, ji ber ku DEP'van fikra xwe gotin hatin cezakirin. Ev qewmîneke ku me gelek aciz dike ye. Ev, mesaja ku ji bilî beşdarbûna PKK'ê tu rê nîn e dide gel."**

Di eynî civînê de tê daxuyandin ku Hemilton ji D. Johnson ku endamê Wezîriya Parêziyê ye jî agahî xwestiye ku ka alîkariya Amerîka ji Tirkiyeyê re dişîne, di têkoşîna bi PKK'ê re de bi kar tîne. Wî jî gotiye ku 6 helîkopter dixebitîne. Alîkariya aborî jî 121.6 milyon dolare. Dîsa tê gotin ku qîma xwe bi wan daxuyaniyan neaniye û ji Johnson xwestiye ku hemû agahiyan bidinê.

## *DQB'ê jî destek da meclîsê*

**Navenda Nûçeyan–** Dadgeha Qanûnê Bingehîn (DQB) jî hildana muafiyeta mebûsên Kurd pejirand. Dadgehê îtîraza ku ji aliyê DEP'ê ve hatibû kirin di 21'ê Adarê de bersivand û bi tenê hildana muafiyeta mebûsê Şirnexê Selim Sadak ne di cih de dît.

Li gorî ku hate hînbûn hin endamên Dadgeha Qanûnê Bingehîn li dijî rakirina muafiyeta **Leyla Zana, Ahmet Türk** û **Mahmut Alınak** ray dane, lê ji ber hindikbûna rayan biryar nehatiye guhertin.

Bi biryara Dadgeha Qanûnê Bingehîn ku îtîraza DEP'ê di nav sê rojan de vekolabûn, **Selim Sadak** jî nû ve gihiya muafiyeta xwe. Lê îtîrazên ji bo **Leyla Zana, Hatip Dicle, Orhan Dağan, Ahmet Türk, Sırrı Sakık**, nehatin qebûlkirin. Bi vî awayî rê ji darizandina wan re tam vebû. Lê biryara dadgehê jî wek destekdana derbeya 2'ê Adarê hate nirxandin.

## Hejmara 3'yan Ognî'yê derket

Kovara Ognî hejmara xwe ya sêyemîn jî derxist. Di vê hejmarê de li ser çand, dîrok û wêjeya gelê Laz, gelek nivîsarên balkêş hene. Wek: Şîroveyek li ser hilbijartina herêmî, nirxandineke dîrokî li ser Topal Osman, danasîna bajarê Atînayê (Pazar). Girîngiya zimanê zikmakî, deqên (metîn) Lazî, xebatên berhevkirinê û hwd. Kovar li Stenbolê tê çapkirin, ev hejmara Adar û Avrêlê ye.


KÜLTÜR DERGİSİ
YIL: 1 SAYI: 3
Fiyatı: 20.000 TL.
MART-NİSAN 1994

Skani nena!

- LAZURİ TEKSTEPE
- KORBALAŞİ SVA
- KOLKHİS - LAZİKA SİKKELERİ
- TOPAL OSMAN DOSYASI
- BİZANS-PERS SAVAŞLARI VE LAZLAR
- YENİ ARGONOTLAR VE KOLKHİS

# Hemî ca mij û dûman o

Wext, wextê Şêx Seîdî yo. Yanî sera hezar û newsey û vîst û ponc. Hemî ca mij û dûman o. Hema herkes zano ke, Îsyanê Şêx Seîdî wexto ke dest pê keno, haziriya jê hema temam nêbiya. Raste rast sîlehê jên, eskerê jên, muhîmatê jên çînyo. En zaf zî, îsyan bêwext dest pê keno. Çi ke hereketê jên, sey ewroyîn ilmî û modern niyo. Mesela hewayo ke ew ro PKK keno, herekatê jên (Şêx Seîdî) êno hewa nêbî. Munewerê jên, wendoxê jên, rastî rast çînebî. Sero zî, xayînê jên zaf bî. Mesela, xayînê jên o pîl, zemanê Şêx Seîdî de, Binbaşî Qasim bî. Yanî, gorê nî sebebûna, gore tayna sebebûna, îsyan ser nêşî.

Wextê îsyanî de, watişdê bav û kalandê ma gore, eskerê Tirkî yenê dewan de geyrenê. Çiqas gede-guda, xort, êxtiyar, cenî-menî estê; hema hema pêrine kişenê. Tira pey, pêro meyitû, raştey dewe defînenê pê ser, şonê. Esker merdimî wexto ke kiştî, hinde zî îşkence kerdo ke, merdimî şinasnayîş bêimkan o. Ay merdimê ke weş mendê, bade yenê meyitandê xwe sero benê top. Her kes meyîtê xwe gêyreno. Feqet, hewayo ke ma cor de vato, eskeranê Tirkî zaf îşkence kerdo, merdimî şinasnayîş zaf zor o. Milet gêyreno, gêyreno... la belê nêşno meyîtê xwe nas biko. Hewnenê ke niya nêbeno, peynî de pêro yenê pêser, çare gêyrenê. Vanê: "Eciba ma meyîtanê xwe senî hewa bişinasnê?" Nêzonê ke se kê... Bade, yew çî yeno hişdê yewerî. Vano ke: "Heke dawil û zurna biyo, ez şehîdê xwe veyueva. Milet şaş mayeno. Vano: "Çi feydê zurna beno ke?" Ay merdimo ke dawil û zurna wazeno, vano ke: "Şehîdê mi dawil û zurna ra zaf hez kerd, ez bawer keno ke, ger dawil û zurna bibo, ma şenê şehîdê mi veynî." Milet qet çî tira fam nêkeno. Feqet, hewnenê ke mirdek zaf wazeno, mecbûr manenê, xebere danê, dawil û zurna yenê. Wayîrê merdî vano ke: "Va dawil û zurna bicenê." Milet vano: "Yaw înî hindasî meyît o. Ma de eyb o, gune yo..." Mirdek vano: "Nêy, şima gere wera de va dawil û zurna bicenê." Milet hewneno ke yewna çare çînyo, qebul kenê. Îşaret danê, dawil û zurna dest pê kena. Wayîrê merdî vano: "Bêrê mi rey de!" Yew kinar de dawil û zurna cinena, yew kinar de zî milet meyîtandê xwe gêyrenê. Beyntar ra yew çend deqa veyrena nêveyrena, hewnenê ke, hinde leşî miyan de yew leşe gorê dawil û zurna ra reqişeyena, wir bena, vindena, wir bena, vindena. Wayîrê merdî hema vazdano şono ay leşî sero vindeno. Vano: "Temam, eno merdimê ma yo." Milet leşe hewnenê, kenê raşt, rind tira hewnenê ke, raşt a, a yo. Wayîrê merdî vano: "Mi şima ra nêva ke, şehîdê mi dawil û zurna ra zaf hez keno?" Milet heyret kenê, vanê: "Dême nî merdimî dawil û zurna ra hinda hez kerdê ke, leşa ey bîle kay kena!.."

**Cemal PÎRANÎ**



*Şêx Seîd*

# *Zekiye Alkan*



*Êware bû*
*"Ba"yek dehat*
*Henasey xoşî Newrozî le gel da bû*
*Wêney çiyay bala berzî*
*Kurdistanî le dil da bû..."*
*"Ba" yek dehat*
*Be seday ser tezênewe*
*Horey dekird*
*Stranî sûrî deçrî*
*Şiîrî Xanî de xwêndewe!*
*"Ba" yek dehat*
*Bo Newrozî yasax kiraw*
*Cejnî lay çiya û rûbar û gel xoşewîst*
*Girî Newroz*
*Cejnî dewîst*
*Girî evînêkî petî*
*Bo Kurdistan*
*Bo bawerî Kurdayetî!*
*Girman heye.*
*Belam kirdine wey yasax û qedexe ye.*
*Lêre ewey bîkatewe*
*Cestey deken*
*Be cêjwanî gule û çeqo..*
*Serî be kêlge bo merg.*
*Lêre ewey bîkatewe*
*Mirovêke zor be cerg*
*Kê ye? Kamtan pey pê deben?!*
*– Mame Yarey agir girtû*
*Nexêr qurban*
*– Qazî Mehemedî aza...û*
*Tirs le nêw dila nebû?*
*– Nexêr.. nexêr*
*– Xanzadî Kurd, yan Qedemxêr*
*– Dîsan nexêr*
*Netanzanî!*
*Kiçêk bû ciwan*
*Ciwan herwek û siîrî bizêw*
*Cestey sipî çeşnî pemû*
*Rûmetî geş wek şekre sêw*
*Kiçêk bû ciwan*
*Dilî pir bû le awatî sûrdageraw*
*Bo azadî û tişk û hetaw*
*Kiçêk bû ciwan*
*Hawrêkanî kokirdewe û pêy witin:*
*– Wa Newroz e û diniyaş xamoş*
*Eger agir nekeynewe qerzar debin*
*Eweta "Ba"*
*be aşkira*
*Gilpe û girrî lêman dewê*
*"Ararat" îş*
*Destî le mil mêju da ye... û*
*Çawerwanî agir dekat.*
*Le ber ewe*
*Biriyarim da, min agirêk bikemewe*
*Gewre beqed xemekanî sedey bîstem*
*Min agirêk bikemewe*
*Êweş hemûtan swênd bidem:*
*"Be Helepce û*
*Ew darey wa*
*Şêx Seîdiyan le jêriya Kuşit"*
*Bilêsekey xamoş neken*
*Neyken be atarêkî serd*
*Her hemûyan siwêndiyan bo xward.*
*Îtir ewiş*
*Xêra û pele*
*Newtî hêna*
*Kirdî be ser cestey xoy da... û*
*Gilpey le giyanL*
*Le ser, le dil beriz kirdewe*
*Bo Newroz û*
*Gelî Kurd... û*
*Bo Kurdistan*
*Agirêkî gewre û pîrozî kirdewe*
*Lew katewe*
*Hemû salê rojî Newroz*
*Serinc biden*
*Le naw dilî agireke da*
*Kiçêkî ciwan*
*Le ser kikafure sipiyekey*
*Singî nermî*
*Be xwênî geş*
*Wişey Newrozî nûsîwe...*
*Kiçêkî ciwan*
*Çawî le aso birîwe... û*
*Wekû vînosî nazenîn*
*Bedem dwa rojî Kurdewe*
*Herdu lêwî:*
*"Pirin le gulî pêkenîn."*

**Mihemed KURDO**
*Çemçemal*

**Neqtik**

*Felek her ga kesêkî helbirî wextî hîlaket ye ke mil bo geyne pet bê pê le kûrsî û eskemîl çi bika.*

***Helbestvanî Kurd Mehwî***

**KÊ ÇI PEKAND?**

**Di hezar salan de bi tenê ez derketim holê.**

*Tansu Çiller*
*Serokwezîra Tirkiyeyê*

# Le dîrokî Kurdan da qisey nesteq

**PAŞA Û GA**

Le Paşa gewrey Rewandiz degêrinewe û delên. Kabrayek xoy be dîwexanî paşay gewre da kird û witî:

– Paşam dezanî yekêk le piyawekanî to gayek lê dizîwim.

Lem kate da melay Rwandiz lewê debê û yekser delê:

– Axir Kabra eger Paşa mezreey ew dinyay be gay to nekêlêt ey çî bikat?!

Paşay gew re ke giwêy lem qiseye debêt yekser ferman dedat gayekey bo bigerêninewe?!

**ŞAY ECEM Û FEQÊ ŞÊTE**

Şay Ecem le dîwexan da danîştibû bangî piyawekanî xoy kird û witî:

– Dû swarî çakim bo amade biken, eyannêrme Cêyeklem kate da Feqê Şête danîştibû, ke emey bîsit yekser witî

– Pşam ewî swarî çak bûn. Zû le diwexan derkewtin.

**ŞÊX REZA Û WALÎ KERKUK**

Şêx Rezay Talebanî deyewêt Walî Kerkuk bibînêt û hendê şitî taybetî pê bilêt, belam ke Şêx Deçête jûrewe û çawiyan be yek dekewê walî yekser pêy delê birore derewe. Şêx Rezaş heman kat em dêre helbestey bo dêt û delêt:

Çermî rûy hênd qayme şimşêrî Mîsrî naybirê

Ger be kewşî key demênê ta qiyamet nadirê

**GORAN Û BEKES Û ŞIÎR**

Fayeq Bêkesî sayîr ke mawey nefî bûnekey tewaw dekat û degerêtewe bo şarî Sûlêmanî hewalî mirdinî Hîwa î kûrî Goranî şayîr debîstêt, boye yek ser berew malî mamosta Goran berê dekwêt. Le wê diway hemû şitêk Bêkes le Goran de pirsêt mamosta nazanim şiîrî taze tan nîye. Mamosta Goran le welam da delêt. Tenha yek şiîr î tazem heye ewîş "le sere mergey Hîwa" daye. Ke şiîreke dehênê û bo Bêkesî dexwênêtewe, Bêkes pêy delêt ke carêkî tirîş boy bixwênê tewe, ke em careş boy dexwênêtewe, Bêkes delêt.

Mamosta herçende dayîkî minalekanîş giwêyan lêye belam birwa bike hez dekem em çwar-pênc ekey tirîş tan bimrêt, min şiîrî wam dewê, çî le mînal bikem.

**Sîrwan REŞÎD**



# Li ber her darê gerîlayek heye

Gava însan bibe neyarê gelê xwe, bibe cahş, çi tiştê gelê wî yê bi rûmet û bi xwînê ve hatiye standin, wan tiştan dixe nav lingan û hem li xwe hem jî li gelê xwe îxaneteke pir mezin dike.

Ez bawer dikim ev nivîsara min ji wan însanan re wê bibe ders. Ez vî tiştî jî, ji bîr ve nakim û dinivîsinim.

Li aliyê Metînan gelek cahş hene. Rojekê ji gundê Celîkan (ku bi navçeya Çinarê ve girêdayî ye) bi navê Behrî zilamek heye. Ev zilam rojekê radihêje kera xwe û diçe êzingan. Diçe nav daran radihêje bivirê xwe. Bi qasî barê xwe êzinga dibire û lê dinêre kerê wî diçe jê dûr dikeve. Bang li kerê xwe dike dibêje:

"Şooşşş. Amed tu bi ku de diçî?"

Erê Behrî navê kerê xwe kiriye Amed. Lê bi qurbana kerê xwe bibe, nizane wê kerê wî niha jê re barê wî bibe. Gava bang li kerê xwe dike û wisa dibêje, carekê dinêre ciwanek bi çek û rext û li pêşiya wî peyda bû. Li paş xwe dizivire dinêre du heb li paş wî ne jî. Vir de direve, wir de dinêre xortê bi çek û rext li dora wî bûn dozdeh heb. Qudûmê wî dişkên. Nizane wê çawa bike û bi ku ve bireve. Ji nav ciwanan gerîlayê komutan dere pêş wî û çar pênc kulmên baş lê dide. Tuf dike ser çavê wî û dibêje:

"Em niha dikarin te li vê derê bikujin, lê belkî zarokên te yên hûr hebin. Lê tu vî tiştî ji bîr ve nekî, tiştê em ji bona wê xwînê birijînin em nahêlin tu kes li wî tiştî heqaretê bike."

Gerîla têrî wî lê didin. Diçin kerê wî digirin û tînin, Behrî jî dixin nav bendeka êzingan û datînin ser kerê, rind dişidînin û kerê dixin rê, pehînekê lê didin û ker diçe.

Ker tê malê, jina wî Hacê (dibe ku navê wî Fatma be jî) dinêre ker hat û mêrê wê nehat. Bang lawê xwe dike dibêje: "Lawê min ker hat û bavê te nehat". Wê gavê mêrik ji nav bendeka êzingan bang dike dibêje jina xwe: "Were ez va me." Jina wî şaş dimîne bawer nake ku ji nav bendekê dengê mêrê wê tê. Bî tirs diçe ber bendekê dinêre erê mêrê wê di nav bendekê de ye û rûçikê wî tev sor û mor bûye. Jina wî şaş dimîne û dibêje:

– Lo, lo..... Çer bû ji te?

– Lê, lê.... Qet nepirse li ber her deviyekê, li ber her darekê gerîlayek heye...

**Rêzan ŞOREŞ**
**Çinar/ Amed**

**Jûjî...** Doğan Güzel



*Li hember îdîayên, "Emê an PKK'ê biqedînin an jî biqedînin" gelê Kurd jî bi yek dengekê li dijî zilm û zordariyê diqîre:*

# 'an SERKEFTIN an SERKEFTIN'

- *Dîsa xwîn li Newrozê gerandin. Li Stenbolê li Polîsxaneya Kasimpaşayê polîs, Vedat Han Gülşenoğlu bi demançeyê kuşt. Hêzên leşkerî jî, bi operasyon û kuştinan ve "Nevruz" derbas kirin(!) û du gundiyên Kurd bi guleresandinê kuştin. Li bakurê Kurdistanê gel riayetî banga PKK'ê kir û Newroz di malên xwe de pîroz kirin, di gel hemû xebat û hewlên dewleta Tirk a ji bo pîrozkirina "Cejna Nevruzê ya Fermî." Li bajarên Tirkiyeyê, deverên ku Kurd lê dijîn, Newroz li derve û salonan, bi beşdariyên mezin û coş ve hate pîrozkirin.*

- *Dewleta Tirk, li hemberî helwesta gel û bandora PKK'ê ya li ser Kurdan, ket rewşeke şermezar û pêkenokî. Xwest kela xwe di serê heyetên xerîb de hêdî bike. Nehişt lijneyên ku ji bo nêrevaniya Cejna Newroz û hilbijartinên 27'ê Adarê hatibûn Kurdistanê, ger û geştên xwe pêk bînin. Li wan dan, hildan binçaviyê, dest danîn ser fîlm û kamerayên wan, bi vî awayî rewşa xwe ya hovane xwe êdî ji Ewrûpiyan jî veneşart.*

**Navenda Nûçeyan–** Gelê Kurd riayetî banga PKK'ê kir û daxwaza wan î pîrozkirina Newrozê ya di malan de, anî cih. PKK'ê belavok belav kiribû û ji gel xwestibû ji ber ku qetlîamên nû neqewimin, Newrozê li derve û bi awayekî girseyî pîroz nekin. Li bakurê Kurdistanê gel, di gel çalakî û kêferatên dewletê ku dixwest Newrozê wek cejneke Tirk bi wan bidine pîrozkirin, li gorî daxwaza PKK'ê pîroz kirin û bi şev jî agirê ronahiyê pêxistin. Li berê govend li dar xistin, stranên azadiyê strîn.

Ji hêla din ve hêzên leşkerî û tîmên taybetî vala nesekinîn. Cerd û nijdeyên xwe birin ser gund û navçeyên Kurd. Operasyonên xwe pêk anîn û bi sedan Kurd girtin. Ji gundên Lice û Hezroyê bi navê Ferman Cengiz (16) û Edip Tanrıverdi (22) ku nû ji leşkeriya Tirk hatibû, bi gulebarandinê kuştin. Li Cizîrê jî cerdevan û hêzên dewletê tevî hev "Nevruz" pîroz kirin, sloganên li dijî PKK'ê qêriyan.

Kurdan ji Serhedê ta bi Botanê, ji Xerzanê ta bi Amedê di gel operasyon û girtinan ên ku ji hêla dewletê ve dihatin pêkanîn, Newroz bi awayê ku ji wan hate xwestin hembêz kirin û guh bi "Nevruza fermî" nekirin.

Heyetên ku ji dewletên wek Fransa, Almanya, Swîsre, Danîmarka, Holanda, Îngilîstanê ji bo nêrevaniya pîrozbahiyên Newrozê û hilbijartinên 27'ê Adarê hatibûn Tirkiyeyê, rayedar û hêzên dewleta Tirk nehiştin ku bi serbestî li bajar û gundên Kurdistanê ger û têkiliyan pêk bînin. Ew hildan binçaviyê, li wan dan, tehde li wan kirin, dest danîn ser fîlm û kamerayên wan. Her wiha gelş û dijwariyê ji rojnamevan û ekîbên TV'yan ên biyanî re jî derxistin. Rê nedan wan ku têkilî bi gel re deynin û bûyeran taqîb bikin

Ev helwesta dewleta Tirk, bandoreke (tesîreke) neyînî li heyetan kir û bû sebebê ku rêxistin û saziyên demokratîk bertekî (reaksiyon) nîşan bidin. Her wiha nirxandin ku dewlet dixwaze kirinên xwe yên hovane ji wan veşêre.

### KURDÊN DERÎ KURDISTANÊ LI PIYAN BÛN

Bajarên Tirkiyeyê dîsa jî pîrozbahî û şahiyên Newrozê re bûn sehne. Li pir deveran ji bilî şahiyên di salonan de, gelê Kurd Newroz li kuçe û kolanên pîroz kir, agir pêxist, govend gerand û ew stran ên şoreşgerî bi lêv kirin.

Kurdên ku ji ber tehde, zilm, pêkutî, koçberiyê û hwd. ji welatên xwe qut û li bajarên biyan cihwar bûbûn wek Stenbol, Îzmîr, Edene, Enqere, Mêrsîn, Antalya, Tarsûs, Ceyhan, Îskenderûn, Muğla, Menemen tevî rênedan, rêlibergirtinên hêzên dewletê, Newroz li salon û derve pîroz kirin. Li hin deveran polîs ji pîrozkarên Newrozê venegeriyan û ew hildan binçaviyê.

### TIRKIYEYA LI EWRÛPAYÊ: ALMANYA

Îsal gelê Kurd, agirê Newroza ku bi gewde û canê Mezluman, Zekiyan û Rehşanan ve pêketibû, bi xwe re birin Ewrûpayê jî. Li wir jî Bêrîvan û Ronahî beşdarî wê karwanê bûn. Kurdan li ser biryara Wezîrê Karê Hundirîn ê Almanyaya Federal, Manfred Kanther, ku çalakiyên Newrozê qedexe dikir, bi meş, xwepêşdan, radana dikana, livbaziyên vegirtinî (îşgalî) yên rê, gar û stasyonan ve bersiv danê. Xwe şewitandin, canê xwe bi gorî gelê xwe kirin û biryardariya xwe bi cîhanê dan nîşan.

Di protestokirina ji ber qedexeya Newrozê ya ji aliyê dewleta Alman, zilma wê û alîkariyên wê yên ji Tirkiyeyê re, ji bo domandina şerê qirêjî ya li hemberî şervanên Kurd 9 kes xwe şewitandin. Ji wan li bajarê Mannheîmê du jinên Kurd di şeva 21'ê Adara ku dispirî 22'ê Adarê de, Nilgün Yıldırım (Bêrîvan) li cih û Bedriye Taş (Ronahî) di 23'yan de li nexweşxaneyê gihiyan şehadeta xwe. Kurdan li ser vê yekê hikûmeta Alman bi livbaziyên cihê protesto kirin û li Berlin, Duselfdort, Duisburg, Dortmond, Bonn û Kolnê dikanên xwe girtin.

Nilgün yıldırım (Bêrîvan) û Bedriye Taş di mesaja xwe de ya ku beriya qewmînê nivîsînbûn, livbaziya xweşewitandinê bi, **"Em dizanin û bawer dikin ew agirê azadiyê ku me pêxistiye wê bibe sebebê dadana agirên mezin" diyar dikin û wiha didomînin: "Gewdeyên me, ramanên me bila ji gelê Kurd û ji hemû mirovahiyê re bibe diyarî."**

Ji aliyê din ve gelek livbaz ji hêla polîsên Alman ve hatin girtin û bi şîdeta wan ve rû bi rû man. Li gorî agahî û hayên bi destê me ketine ji 80 kesî bêhtir mirov di destê polîsên Alman de ne. Livbaziyên xweşewitandinê zehf dêhna raya giştî ya dinyayê kişand û medyaya Ewrûpayê li serê rawestiya di gel bêeleqiya çapemeniya Alman. Wekî din jî Kurdan bi çalakiyên xwe kirin ku, hikûmeta Alman komîteyên krîzî çêbike.

### NEWROZÊ EWRÛPA RONÎ KIR

Newroz li hemû Ewrûpayê di gel dostên Kurdan ve hate pîrozkirin. Li hin bajaran wek Parîs, Berlînê û Russelshaîm esnafên Kurd dikanên xwe venekirin.

Kurdan li Ewrûpayê nolî ku li Amed û Cizîrê bin, Newroz bi agir, govend û şahiyan ve li dar xistin. Di 21'ê Adarê de li zehfî navendên Ewrûpayê bi beşdariya girseyên mezin ve meşên bi mêlîdeyan (meşaleyan) çêkirin û roniya neyarê tariyê li ser wan axan jî rijandin. Wek Parîs, London, Stockholm, Viyana, Zurîh, Oslo, Den Haag, Berlîn, Hamburg û hwd.

Di hemû meş û xwepêşdanên bi mêlîdeyên agirê Newrozê de sloganên li dijî Komara Tirk û hevalbendên wê hatin qêrîn. Ji hêla din ve gelê wan welatan bi xwe jî beşdarî meşan bûn. Di milê meşvanan de meşiyan. Sloganên ku pirtir hatin qîrandin, wek: "Bijî PKK, Bijî Newroz, Bijî Serok Apo, Artêşa Tirk ji Kurdistanê biqeşite, Dawî li alîkariya Tirk bînin, Gerîla lê dide, Çiller bi girînê dikeve, Bêrîvan nemir in, Ronahî nemir in" bûn.

### OTORÎTEYA NETEWEYÎ CAREKE DIN XWE DA NÎŞAN

Newroza sala 1994'an wek pêşbaziya di nav dewleta Tirk û PKK'ê de bihurî. Lê PKK li dijî "Nevruza fermî" bi ser ket û gel jî guh da banga wê. Her çiqas rêveberiya Tirk xwest "Nevruz"a xwe bi gel bide pîrozkirin û pejirandin jî, negihîşte armanca xwe. Li Kurdistanê gel ji sedî sed bersiv da banga PKK'ê û li Tirkiye û deverên dinyayê jî bi awayê ku serokatiya Partiya Karkerên Kurdistanê xwestibû liviyan.

Kurdên ku li komarên Sovyetîstana berê dijîn jî Newroza xwe pîroz kirin. Wek Gurcîstan, Ermenîstan, Kazakîstan, Azerbeycan, Ozbekîstanê. Dîsa hate hînbûn ku Kurdên başûrê biçûk (Sûrî) ji ber şînîbûna malbata Hafiz Esad Newroz pîroz nekirine.

Li Rojhilat û Başûr gelê Kurd bi beşdariya girseyeke zehf mezin û coşdar ve Newroza 1994'an hembêz kirin.




*Gel bertekiya xwe bi awayên ji hev cihê li hemberî helwesta hikûmeta Alman dan nîşan. Di nav van livbaziyan de vegirtina otobanan jî hebû.*

# Leylaya min a delal

*Ez dixwazim hemû dilxwazî û piştgiriya xwe ji we re û ji pênc parlementerên kurd ên hevpîşe (hevmeslek) yên we ku di azmûneke dijwar de dijîn îfade bikim.*

*Qewmînên li welatên we roj bi roj carinan jî saet bi saet taqîb dikim. Rewşa we, jiyana gelê Kurd û ew talûkeyên li ser pêşeroja hevpar a Kurd û Tirkan a di çarçoveyeke demokrasiyeke rasteqîn de wisa tesîr li min dike ku ez hemû enerjiya xwe ji bo hişyarkirina raya giştî ya Rojavayê û hikûmetên wan terxan (cihê) bikim û cidiyet û elzembûna meseleyê bi wan bidime zanîn.*

*Bizanibin ku çi tiştê ji destê min were ji bo parastina maf û azadiyên mirovan, ji bo demokrasiyeke pirejimarî, ji bo daxwazên gelên wê yên meşrû yên ji bo xatirê jiyaneke bi şeref û nasîna nasnameyê ezê bikim û ez bi dil û can bi têkoşîna we ya dijwar lê bi resen re me.*

*Di gel zor û dijwariyên ku hûn ji sala 1980'yan ve dijîn, we ji şûna bedbînî û serhildanê, riya têkoşîna demokratîk a ku bihevrebûna Kurd û Tirkan a wekhev û biratiyê diparêze hilbijart ku ew jî rê nade rik û neyartiyê.*

*Ev helwesta we tenê dikare bi herkesî heta tevî neyarên we bike ku bi heyranî we bi bîr bînin. Ji vê yekê bawer bikin û rewşa Nelson Mandela ji hişê xwe dernexin.*

*Wê di hevdîtina me ya dawîn a li Parîsê de gotibû ku hûn min wek dayîkek qebûl dikin. Ez jî niha dikarim bibêjim ku ji ber hebûna keçekê min î wek we wêrek pir şanaz im û ezê mîna ku çawa bi zarokên xwe yên helal ve eleqedar bibim, bi we re jî wisa.*

*Ji we re bi vê nameyê re pênûsek ji yên xwe dişînim. Ji min re bi qasî ji destê we tê li ser bihurîna rojên xwe binivîsin û bişînin. Heta hûn hînî Fransizî bibin, ji min re bi Kurdî an jî bi Tirkî binivîsin; çawa dilê we bixwaze. Kendal wê jî min re wergerîne.*

*Ez bi hêvî me ku bi saya xebatên raya giştiya demokratîk a dinyayê û welatê we di demeke nêzîk de hûnê bigihin azadiya xwe.*

*Bi vê bendewariyê we bi dilovanî maç dikim û cejnek baş a Newrozê dadixwazim.*

**Danielle Mitterrand**



Danielle Mitterrand



Leyla Zana

## ..........NÛÇEYÊN CENGÊ..........

# Gerîla berê xwe da partiyên dewletê

*Li tevahiya Tirkiyeyê û nemaze li Kurdistanê, ji bo pîrozkirina cejna Newrozê bi sedan kes hatin binçavkirin an jî hatin girtin. Li ser banga PKK'ê gelê Kurdistanê bi piranî cejna Newrozê di malê xwe de pîroz kirin. Ji bo vê yekê jî hem hêzên dewletê fersenda kuştin û qetlîaman nedît û hem jî cejna wan î fermî "Nevruz" tu îtîbar nedît.*

**Navenda Nûçeyan–**

**16 Adar 1994–** Operasyonên ku ji aliyê hêzên dewletê ve li Çiyayê Agirî çêdibe, kete roja çardehan. Ev operasyon li navçeya Aralixê ku li ser Îdirê ye jî didome. Di van operasyonan de 5 leşker û 2 gerîla mirin û li dor 30 leşkerî jî birîndar bûn. Ji hêla din ve li navçeya Çemîşgezekê ku li ser Dêrsimê ye jî, di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket, tîmekî taybetî û gerîlayek mirin.

Li Amedê polîsek, li Taxa Melîkahmedê ji aliyê 2 kesan ve hate kuştin. Navê polîsê ku hate kuştin Ferrûş Karayîgît e.

Li Kercewsê Halîl Taşan, ji aliyê polîsên emniyetê ve hate binçavkirin.

Hêzên dewletê li Qoserê Taxa Tepebaşiyê 20 kes girtin. Ji van 12 kes hatin berdan û 8 kes jî girtî man.

**17 Adar 1994–** Gerîlayên ARGK'ê li Sînektepeyê ku di nav hidûdê navçeya Bazîdê de ye, kemînek li pêş tîmên taybetî danîn, tîmên taybetî mirin.

Li gundê cerdevanan li Xerawera (Haliören) ku li ser navçeya Çinarê ye, traktorek li mayînê qelibî, Hasan Özpinar mir û 3 kes jî birîndar bûn.

Kesên nenas li Amedê Taxa Alî Emîriyê karkerê saziya elektrîkê (TEK)'ê M. Kadrî Koyuncu kuştin.

Gerîlayên ARGK'ê, Pira Gêrêxanê, ku di navbera navçeyên Dihê û Banê de ye, rûxandin. Wek tê zanîn ku hêzên dewletê, ji bo cejna Newrozê û hilbijartinên Adarê 150 hezar leşker sewqî Kurdistanê kirin.

Li Agiriyê 3 kes, li Amedê û Tûxê jî 2 kes, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin.

11 gerîlayên ku ji aliyê dewleta Îranê ve teslîmî dewleta Tirkiyeyê kirine, di bin îşkenceyê de ne.

**18 Adar 1994–** Di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de li devera Sînektepyê ku li ser Bazîdê ye şer derket, 2 tîmên taybetî û sê leşker mirin û 4 tîmên teybetî û 6 leşker jî birîndar bûn; ji hêla din li navçeya Dicleyê ku li ser Amedê ye, di 16'ê Adarê de di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket, 8 leşker mirin. Di 16'ê Adarê de di navbera navçeyên Selîm û Sarikamişê de, ku li ser Qersê ne, şer derket, 3 leşker û 2 gerîla mirin.

Qumandariya ARGK'ê ya Eyaleta Amedê belavokek ji bo hilbijartinên Adarê weşand. Di belavokê de qedexekirina mitîng û civînan hene.

Tabûra gerîlayên jin, li ser riya Çepekçûrê û Amedê 60 wasite sekinandin û karmendek, bekçiyek û leşkerek bi xwe re birin. Ji hêla din ve gerîlayan 3 pire rûxandin, barajeke li Ziravik ku li ser Qilabanê ye, û şantiyeke YSE'ê jî şewitandin.

4 xanî li gundê Uranise ku li ser Tûxê ye, ji aliyê hêzên dewletê ve hate şewitandin û 9 kes jî hatin binçavkirin.

Li Amedê, buroya hilbijartinê ya Partiya Sosyal Demokrat (SHP)'ê hate bombekirin. Di bombekirinê de yek mir û 17 kes jî birîndar bûn.

**19 Adar 1994–** Tirektora cerdevanê gundê Enara û Zexigê ku li ser navçeya Kerboranê ne, li mayîna gerîlayan qelibî, 4 kes mirin. Piştî bûyerê hêzên dewletê ji gundê Gundikê Hecî 5 kes binçav kirin.

Li gundê Kawaye ku li ser navçeya Çinarê ye, minîbûsek li mayînê qelibî, gelek birîndar bûn.

Li Qoserê hêzên dewletê girtin ser mala gerîlayekî. Di ser girtinê de bavê gerîla Huseyin Dağ û diya wî Hepla Dağ hatin binçavkirin, lê dû re Hepla Dağ hate berdan.

Gundên Mezrê, Tilhasna, Himêdiyê û Hesarê ku li ser Kercewsê ne, ji aliyê hêzên leşkerî ve ji bo cerdevaniyê tên tehdîtkirin.

Cerdevanên Qoserê ji gundê Çewzatê (Cewîzpinarê) jinek (Şadiye Çelik) revandin. Cerdevanên ku jin revandine di bin emrê Sercerdevan Abdûllah Kazat de ne.

Li Amedê Şeyhmûs Yavûz, ku di 11'ê Adarê de ji aliyê hin kesên nenas ve hatibû revandin, bi mirinî hate dîtin.

Ji bo cejna Newrozê hêzên dewletê li gelek bajaran (Mêrsîn, Tarsûs, Dîlûk, Amed, Stenbol, Wêranşar, Elîh û Hazo) 235 kes binçav kirin.

**20 Adar 1994–** Berî pîrozkirina cejna Newrozê bi sedan kes, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin. Li Êlihê 100 kes, li Misircê (Kurtalanê) yek, li Sêrtê ji taxên Çakmak û Bitimê gelek kes, li Enqerê 257, li Stenbolê 84, li Dîlûkê 4 kes û li Mêrsînê jî 9 hatin binçavkirin.

Hêzên dewletê girtin ser gundên Şedîrkê (Kamişli), Aynahîsarê û mezraya wê Gaza Baloka ku li ser navçeya Hezo yê ne. Di sergirtinê de hêzên dewletê gundî ji bo ku di hilbijartinan de dengên xwe bi kar bînin tehdîd kirin. Piştî sergirtinan jî 5 kes binçav kirin. Li gundê Kazaköyê jî, ku li ser navçeya Dîgorê ye, hêzên dewletê 2 kes binçav kirin.

Li gundê Kertalanê (Sugeçer) ku li ser navçeya Qerqeliyê (Özalpa) ye, 4 kes ji ber wêneyekî dawetê, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin.

**21 Adar 1994–** Hêzên dewletê li Gabarê û li Çiyayê Bizina ketin 2 kemînên gerîlayan, di yekê de 4 leşker mirin û ji ya din jî tu agahî bi dest neket. Ji hêla din ve li gundê Deşîna, ku li ser Dihê ye, gerîlayên ARGK'ê avêtin ser qereqola gund, 3 leşker mirin û gelek jî birîndar bûn. Li navçeya Çemîşgezekê ku li ser Dêrsimê ye di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de gelek leşker û gerîlayek mirin.

Ji bo pîrozkirina cejna Newrozê kesên ku agir pêxistin û şahî çêkirin ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin.

Li Stenbolê, Îzmîrê, Edenê, Amedê, Meletiyê, Dîlûkê, Tarsûsê Çepekçûrê, Dihê û gelek bajar û deverên din, bi sedan kes hatin binçavkirin. Ji van li Tarsûsê 150 kes û li Amedê jî 100 kes ji bo pîrozkirinê hatin binçavkirin.

Operasyonên ku hêzên dewletê li çiyayê Agiriyê û derdora wê çêdikin didome. Ji ber van operasyonan xelkên gundan, ji malên xwe û gundên xwe dernakevin.

Mezraya Dalan a gundê Okçular ku li ser navçeya Karakoçanê ye, ji aliyê hêzên dewletê ve hate şewitandin.

**22 Adar 1994–** Li çiyayên Alaşar ku di nav hidûdê navçeya Selîmê de ye, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de helîkopterek ket û gelek leşker û gerîlayek mirin. Ji hêla din ve li Gabarê, li Çiyayê Bizina helîkopterekê, leşkerên ku derketibûn operasyonan gulebaran kir, gelek leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.

Wasitayek leşkeriyê li navçeya Kercewsê ku li ser Êlihê ye, li mayînê qelibî 4 leşker mirin û 11 leşker jî birîndar bûn. Li navçeya Licê ku li ser Amedê ye jî wasitayek leşkerî kete kemîna gerîlayan, 3 leşker mirin.

Li Êlihê kesên nenas 2 kes (Fahrettîn Nasiroğlu û Muhabettîn Kazar) kuştin.

Cerdevanên gundê Çiğrikê ku li ser Girêsorê (Sîwerekê) ye, avêtin ser gundê Darikê (Eser) ku li ser Wêranşarê ye, gundiyek ji aliyê cerdevanan ve hate kuştin û cerdevanek jî hate birîndar kirin.

Li gundê Zeryê ku li ser Hezroyê ye, du kesên ku ji aliyê hêzên leşkerî ve di 19'ê Adarê de hatibûn binçavkirin, bi mirîtî hatin dîtin. Li gorî yekî bi wan re hatibû binçavkirin (Şaban Pehlîvan), Ferman Cîngöz û Edîp Tanriverdî ji aliyê Serbazê (Üsteğmen) Qereqola Hazroyê ve hatine kuştin.

Hêzên dewletê, ji bo gelê Kurd (li ser banga PKK'e di hilbijartinan de neçin ser sindoqê,) biçin ser sindoqên hilbijartinê, dest bi zordariyê kirin. Hêzên dewletê ji bo vê yekê gundên Farqînê ku li ser Amedê ne, gundên Dêrikê ku li ser Mêrdînê ne û gundên Kanîreşê (Karliovayê) ku li ser Çepekçûrê ne, tehdîd kirin. Ji hêla din ve hêzên dewletê li gundên Kanîreşê 200 kes û li gundên Doğanşehîrê ku li ser Meletiyeyê ye jî 20 kes binçav kirin.

Li Edenê 200 kesê ku di pîrozkirina cejna Newrozê de hatibûn binçavkirin, 18 heb hatin girtin.

## *Nirxandineke kurt li ser gengeşiyeke zimên*

# Bêjeya 'Kurdî' ne nav e, ne bi wateya Kurdan e

Mamostên hêja B. Rizgar û Z. Farqînî di çend rûpelên Welat de li ser bêjeya "Kurdî" hin pirsên rêzimanî anîn holê. Mamoste Farqînî dibêje ku paşpirtika "î" ya tewangê bi bêjeya (peyva) "Kurdî" vebûye. Herçi Mamoste B. Rizgar vê yekê dispêre warê watesazî (semantîk) yê.

Ji ber ku ez naxwazim bi firehî herim ser vê pirsê jî, lê belê ji neçarî ezê jî bi nêrîna xwe li ser vê yekê rawestim.

Erê wek ku Mamosteyê mezin Celadet Bedirxan dibêje, zimanê me zimanekî tewangî ye. Bi rastî jî, navdêrên nêr ên nas û nenas dikarin paşpirtika "î"yê ya tewangê bistînin, heger ew bibin kiryar ji lêkerên derbasbûyî, di wextê bihurî de. Di vir de em dikarin gelek mînakan bînin:

Mirovekî saf (nenas e)
Ehmedî got (nas e)

Lê herçi "î"ya bêjeya "Kurdî" ne bi vê bûnê ye. Wek nimûne em nikarin bibêjin, "Kurdî got." Lê belê em dikarin bibêjin:

Kurdekî got (nenas e)
Ehmedê Kurdî got (nas e)

Di vê nimûneya dawî de, di bêjeya "Ehmedê" de, "ê" ya tewangê ye, lê "î"ya di bêjeya "Kurdî" de ne ya tewangê ye.

Ji vir pê ve êdî pirs ji Mamoste B. Rizgar tê kirin. Gelo bêjeya "kurdî" ji ku û ji çi hatiye afirandin? Gelo di zimanê me de ev forma hanê tenê di warê watesaziyê de ye, yan jî morfolojiyê de ye?

Helbet çi bêjeya heye ew dibe bêje, ew dibe xwedî delaletekê. Bi gotineke din, ew tiştekî, yan jî kesekî dinimîne. Êdî di vî warî de wê neyê qebûlkirin, dema yek bibêje mebesta min ji bêjeya "Kurdî" watesazî ye. Çimkî çi gava guhertin di forma bêjeyê de çêdibe, guhertin di wateyê de jî çêdibe. Ji ber vê yekê, nabe em bibêjin wateya "Kurdan" û "Kurdî" yek e. Na, ew ne bi wateyên xwe û ne jî bi kategoriyên xwe yên rêzimanî ve yek in.

Wek ku nas e, bêjeya "Kurdan" navdêra resen e, tewangê ye û pirejimar e. Lê belê bêjeya "Kurdî" navê nîsbetê ye, yan jî rengdêra navdêrî ye. Mîna rengdêrê ew forma zayendê û mijarê nastîne. Nimûne:

Keça spehî
Keçên spehî
Xortê spehî
Xortên spehî

Di vir de xweş xuya dibe ku, di hemû rewşan de bêjeya "spehî" ya rengdêr forma xwe neguhert û weke xwe ma.

Eynî mînak ji bo rengdêra navdêrî:

Keça Kurdî
Keçên Kurdî
Xortê Kurdî
Xortên Kurdî

Mîna ku em dibînin bêjeya "Kurdî" wek rengdêrê, forma xwe neguhert.

Gelo ev halet di zimanê Kurdî de çi ye? Yan jî rengdêra navdêrî çi ye? Bi gelemperî ev bêjeya hanê ji navdêra afirandî durist dibe? Bi forma xwe mîna rengdêrê nayê guhertin û bi wateya xwe nêzî navdêrê ye? Ji ber vê yekê, jê re tê gotin rengdêra navdêrî û ew bi alîkariya paşpirtika "î"yê tê afirandin. Wek nimûne:

| Navdêra afirandî | Rengdêra navdêrî |
|---|---|
| Çiya | Çiyayî |
| Gund | Gundî |
| Diyarbekir | Diyarbekirî |
| Farqîn | Farqînî |
| Dihok | Dihokî |

Lê belê ku navdêr bi dengdêra "î", yan bi "e" temam bibe, wê gavê ew ji rengdêra afirandî durist dibe:

| Navdêra afirandî | Rengdêra navdêrî |
|---|---|
| Berî–berîvan | Berîvanî |
| Bêrî–bêrîvan | Bêrîvanî |
| Rojname–rojnamevan | Rojnamevanî |

Şanek: Dibe ku navdêr ne bi dengdêrekê temam bibe, lê belê ew jî ji navdêra afirandî tête duristkirin. Wek mînak:

| | |
|---|---|
| Nêçîr–nêçîrvan | Nêçîrvanî |

Li ser vê bingehê, di zimanê Kurdî de nîsbeta hemwelatiyê li gorî navê welatan forma rengdêra navdêrî distîne.

| Navê welatan | Nîsbet (Rengdêra navdêrî) |
|---|---|
| Amerîka | Amerîkî |
| Swêd | Swêdî |
| Iraq | Iraqî |
| Îran | Îranî |

Lê belê em dibêjin:

Kurdistan–Kurdî (Kurd)

Bi vî tagirî ez forma bêjeya "Kurdî" fêm dikim û diyar e bi riya diskusiyonên (gengeşiyên) vekirî emê karibin nêrîna durist nas bikin.

**Bavê NAZÊ**

# Du helbestên wergerandî ji helbestên Mehmûd Derwîş

## JI DIYA MIN RE

Ez bêriya nanê diya xwe dikim
Qehweya wê.. destdana wê
Zaroktî, di hundirê min de,
Roj bi roj mezin dibe
Û ez ji temenê xwe hez dikim
Naxwazim bimirim
Ji fedya hêsrên diya xwe re
Dayê
Min bike desmalek ji hesrên xwe re
Û hestiyê min bi geyayekî
Ji pakiya lingên te pîroz bûye, veşêre
Bi keziyên xwe
Destê min girê bide
Bi tayekî ji dawa kirasê xwe
Belkî ez bibim xwedayek
Dema di kûraniya dilê te de rûnim.
Eger ez vegeriyam
Min bike êzing ji tenûra xwe re
Min bike risten li ser banê malê
Ez bûme kal
Ji ber ku min rawestîna bêyî li mêja te bi ro
Winda kiriye
De vegerîne.. Stêrkên zaroktiyê vegerîne
Da ku ez jî bi çivîkan re
Li hêlîna bendewariya te vegerim.

*Ji dîwana: Aşiq mîn Filistîn*
*(Evîndarek ji Filistîn)*

## WELATO

Ey sîperê ku nikilê gir
Di çavê min de diçikîne
Tenê ez bi eniya xwe
Û hêrsa dil
Pêşberiya mirinê dikim
Min temîn kiribû
Dilê min weke darekê biçînin
Û eniya min
Bikin hêlîna kevokan
Ey sîperê ku ez ne layiqî te me
Ey welatê min
Em çêbûn.. Bi birînên te mezinbûn
Me darên berrûyan xwarin
Da ku zayina sibehan te bibînin
Ey mirina efsaneyî
Hîn nikilê te yê sor
Di çavê min de ye
Weke şûrekî
Ji agir.

*Ji dîwana (AXIR UL LEYL) Dawiya şevê*

**Wergerandin ji Erebî: J. DOST**

hejmar 41




DERKET

*Pêşengê helbesta klasîkî ya nûjen di sedsala bîstan de Abdurrahman Begê Baban*

# 'Axa mulkî te ekêlim bende û miskînî tom'

### HELBESTVANÎ Û JIYANA WÎ

Zîwarê wî li bajarê Silêmanî ew li gorî salnameya koçî di sala 1298'yan de (1881'ê salnameya zayînî) Xwendina xwe ya seretayî di dibistanên Silêmaniyê de û ya taybetî jî li dibistana Ruşdî ya leşkeriyê qedandiye. Di Ruşdiyê de fêrî zimanê Tirkî dibe.ji ber daxwazên wî yên hînbûn û perwerdehiyê kete nav dibistanên olî û ji kaniya wê ya çandî û zanistî gelek sûd wergirt û dest bi lêkolin û vekolînên zanistî kir. Bû xwediyê çandeke kûr û fireh. Xwendevan û haydarê toreya herêmê, bi taybetî ya helbesta Erebî, Kurdî, Tirkî, Farisî bû. Ew di navenda nifûsa Silêmaniyê de mîna karmendekî xebitî, wek nivîskarê nifûsê dihat nasîn û ji ber wî karî bû xwedî navekî navdar, ango Ewrehman Begê Nifûsê.

Di destpêka jiyana toreyî de, wî bi navê "Hizmî" helbestên xwe belav kirin. Piştî şikestina bajarê Silêmaniyê û ketina wê ya bindestê dagirkerê Îngiliz, di sala 1918 'an de û ji ber nêrînên dijiyatî û reqeberiyê, ev helbestvan bûye nîşana binçavî û çavpêketiya desthilatdarên Îngilîz li Kurdistanê. Ji ber wê jî navê xwe guhart û ta mirina xwe, bi navê "Baba" hate nasîn.

Bi rêketina şoreşa Mehmud Hefîd ya di sala 25.5.1919' an de, Baba çareserkirina derd û kulên xwe, hêviyên xwe di vê şoreşê de dîtibû. Ji ber wê jî bi hemû derfetên xwe kete berdestiyê û berevaniya vê şoreşê. Eniyeke diplomasiyê li ser dijminê Kurdan vekir û di riya vê eniyê de xwest ku dengê neteweya Kurd bigîhîne cîhanê, da ku gilî û gazindên xwe bidin xuyakirin. Lewre jî riya xwe dabû Mehabadê û Tewrêzê û bi balyozkerên welatên Amerîka, Fransa, Îtalyayê re rûnişt û ji wan re diyar kir ka çi bi serê Kurdan de, ji ber siyaseta Îngilîz, hatiye. Ji wan xwest ku zorê li ser hikûmeta Îngilîz bikin, da ku ev siyaseta dagirkeriyê biseknînin û Sozên (prensîbên) Wilson bi cih bînin. Bi taybetî benda 14'an, ya ku têkildarî rewşa gelê Kurd e. Di riya vegerê ya li ser bajarê Silêmaniyê de, li bajarê Banê rastî şoreşgerên Şêx Mehmûdê Hefd hatin.

Li wir jî şoreş li hemberî artêşa Înglîz şikest. Piştî şikestina şoreşê, hikûmeta Îngilîz biryara dûrxistina wî ya ji Kurdistanê da. Piçekî li dûrî welatê xwe jiya. Piştî efûyeke taybetî zivirî Kurdsitanê û nema careke din dest bi karê siyasî kir, lê di helbestên xwe de şerê li dijî desthilatiya faşîzmê dikir û ji bo welatekî serbixwe ket binçav, hate zîndankirin. Bi vî awayî mîna jiyaneke şoreşger, ji bo azadî û serxwebûnê jiyana xwe domand ta mirina xwe ya di sala 1967'an de, di temenekî 80 salî de ku çû ser dilovaniya xwe.

> *Helbesta wî mîna fenerekê, rê li ber rêwiyan rohnî dike. Ji ber van egeran helbestavanê nemir teqînek û şoreşek di binyada helbesta Kurdî de kir. Ew yekemîn pêşeng bû, yê ku di qirna 20'an de nûjenî xiste helbestê û yekemîn kes bû ku nerazîbûna xwe diyar kir li ser rewşa ramyarî û civakî ya gelê Kurd, bi şêwazeke helbestî û hêsan derbirî. Ew naverokên helbestî yên rengareng, bi bûyerên ku li Kurdistanê qewimîn hatin xemlandin. Gava em dibêjin Baba şoreşeke helbestî kir, ew nayê vê wateyê ku wî herişandineke binyadî der mafê helbesta Kurdî ya klasîkî de kir, ji ber ku herşandin û hilweşandin tunebûne.*

### BABA Û PÊŞENGIYA HELBESTÎ DI DIBISTANA NÛ DE

Berî ku Baba bibe helbestvan, ew zanyarekî gewre û xwedî hişekî vekirîbû li ser hemû cureyên zanistiyê. Helbesta wî zayîneke xwezayî ji derdkêş û trêşkdaneke giranbuha û ji nêrîn û hêviyên niştimanî bûn. Ew dibêje: "Helbestvanê resen ew e ku derdkêşiya gelê xwe derdibire, nêziktirîn xemxwarên qata bindest û belangaz e; ji ber ku helbestvan bi viyana hestê hunerî û nîgaşa (xeyala) nazik derdibrîne. Ziman û şeyeseke (wesfeke) helbestî dikare bi xurtî wan peyvên zimanê gelêrî bixîne hundirê kakileke herî xweşik, balkêş û bike hunerekî bi bandor û çekeke şerker û peyveke hîkakirî û bi wê vînê gel dihêvojîne, da ku ev rewşa nebaş nepejirîne û riya dagirkeran bibire".

Helbesta wî mîna fenerekê, rê li ber rêwiyan rohnî dike. Ji ber van egeran helbestavanê nemir teqînek û şoreşek di binyada helbesta Kurdî de kir. Ew yekemîn pêşeng bû, yê ku di qirna 20'an de nûjenî xiste helbestê û yekemîn kes bû ku nerazîbûna xwe diyar kir li ser rewşa ramyarî û civakî ya gelê Kurd, bi şêwazeke helbestî û hêsan derbirî. Ew naverokên helbestî yên rengareng, bi bûyerên ku li Kurdistanê qewimîn hatin xemlandin. Gava em dibêjin Baba şoreşeke helbestî kir, ew nayê vê watayê ku wî herişandineke binyadî der mafê helbesta Kurdî ya klasîkî de kir, ji ber ku herşandin û hilweşandin tunebûne.

Lê mebesta wî pêşketinek e, nûjenkirina navrokê ye. Ji ber ku tiştê herî girîng di helbestê de nirxa giyanî û hestên hunerî tevî nîgaşeke dahînanî û naverokek manevî ye. Baba xwe xiste qul û quncikên tarî di civakê de û bi zîrekî xwe kire awînekî (neynik) rewan, ji azar û keserên çînên bindest re di helbesta xwe ya bi navê Axa de, li ser erzhalê rewşa cotkaran û şepirzeyên wan di siya darebegên xwînmij de radiweste. Baba ji me re dişeyêsîne (teswîr dike) ku çawa beg û axa, bi cotkaran re didin û distînin û çawa cotkar di bin nîr û zilm û daxwazên wan de dinalin. Bêyî ku axa guhên xwe bidin wan belengazan, ev jî dibe egera ku cotkar dev ji karê xwe yên di zeviyê derabegên Kurd de berdin û direvin berê xwe didin bajaran. Li vir jî Baba ji vê rûdanê (reyalîst) tabloyeke hunerî û dil bi êş werdigire.

*Axa mulkî to ekêlim bende û*
*miskînî tom*
*Rojî sexlet nokerî xençer weşênî*
*hênî tom*
*Şir û mastî roj bi roj gîsk û kaûn*
*hênî tom*
*Her reqî helsa be dayîk û bawkewe*
*pirr ciwînî tom*
*Bê ziman û kesnezan û fêrî barkêşî*
*û kerim*
*Bareket zor qorse Axa çon le jêrî*
*derperim*
*Genim û cokêm pêgeyşt hatî be*
*dûsê cerdewe.*
*Kewtîte naw şaraw melokanim be*
*bigrewe berdewe*
*Dewreyêkî naw perêzit do be; şîf û*
*werdewe*
*Le milê şaraw cê perêzit kird be şiw*
*û werdewa*
*Rehmî kird giwaya be halem genim*
*dane şeş texar*
*Lem wêre hawar bikem tirsam le*
*zille û darîpar*
*Genimeken sur bu xemim danê be*
*werzên û sepan*
*Yek be yek pêwan le xerman resmî*
*kolkêş û şiwan*

Helbesta Kurdî nema dikare bi erka xwe rabe, wek çawa jê tê xwestin û di qonaxeke hişk de derbas bibe. Encamên wê yên nebaş berî serdema Baba tê dîtin. Bi taybetî li dawiya sedsala 20'an de nema dikare ji vê çarçoveya kevnar a dibistana Nalî derkeve. Ew nûjenî ya ku Baba pêk anîbû, nedikarî bi tenê helbesta Kurdî veguhesta radeyeke hunerî ya bilind ku bikariya wan bûyerên nû yên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bîne ziman bêyî hebûna Şêx Nûrî Salih û Goran; wan bi hev re, bi avakirina rêbaza nû di helbesta Kurdî de, li ser bingeha teşe û naverokeke nû rê li ber vê yekê vekir. Lê, berzbûna Baba wek helbestvanekî pêşeng û di pêşiya pêşengên ku dixwestin nujenî têxin nav helbesta Kurdî bi demeke pêwist ve hate girêdan.

Ev dem a xuyabûna serhildan û şoreşên Kurdî li Silêmaniyê, Amed û deverên Şikak an bi vî hawî di nîvê duyemîn a sedê 20'an de livek xort, di tevgera nûjenkirina helbesta klasîkî û gelek karên dilsoz hatin xuyakirin. Ji bo xelaskirina helbestê ji teşeyên klasîkî yên kevnare, jêderkê wan karên hanê ji bandora bûyerên çandî, ramyarî (siyasî), civakî li nik gelên hevsî (cîran) ev guhertinên han hiştin, ku ji ziman û pênûsên wan berhemên giranbuha derkevin, di helbesta Kurdî de afirînên herî baş bi destê Baba çêbûn. Lê ev guhertin ne bi hêsanî pêk hat, reqeberiyeke tund û tûj kete pêş lehiya helbesta nûjen, ji layê gelek rewşenbîrên Kurd ve. Lê ev şepola han berdewam bû ta ku keseyetiyeke serbixwe ji xwe re afirand, cih li helbesta klasîkî teng kir û bû awayeke ragihandin a herî mezin. Baba dixwest ku gel bi helbest ve girê bide. Riya nûjenî li ba wî berê xwe dabû ber naverok, babet û wateyên pirrtirîn ji teşeyên derveyî, kêş û rêzbendan, lê parastina Baba li ser kêş û rêzbendan û dengên kevnar ên ku di dibistana Nalî de bi kar dihat, jê re nebû kelem di riya xistina guhertina rêzên helbestên nûjen de. Ji layê babet û naverokê ve û di gelek helbestên xwe de li ser pirsgirêkên civakî yên ku binyada civaka Kurdî dihejand, sekinî.

Di hemana helbestan de babetên lome û giliyan vediguhizine şanazî û şayese û veguhestineke hunerî, bêyî ku tu sistanî û valahiyan bigihîne binyada helbestê, dibêje:


*Zor demêke mal û mulkît wa bedes*
*bêganewe*
*Gerdenî berzit şikawe boy bedam û*
*danewe*
*Nale nalit dê bezam û derdî bê*
*dermanewe*
*Cerg û dil letlet be mûkî xencer û*
*peykanewe*
*Çawrêyî rojekî rêkewtî rojî azadî*
*welat*
*Mujde bê ey mêletî Kurd emro*
*ew Rojhelat*
*Piyawekanit hewil edên bo*
*serbexoyî jiyan*
*Lawekanit dest bi xencer hir weku*
*şherî jiyan*
*Pir û ciwanit wek piling kewtune*
*giyanî dujminan*
*Des be paşma yeş tifeng û topewe*
*wek qareman*
*Pasewaniy serbexoyê Kurd û*
*Kurdistan eken*
*Yek be yek hatune meydan û fidayî*
*can eken*

**Mahmûd Ahmed MUHEMED**
*Werger ji Erebî:*
**Fener ROJBIYANÎ**

## Kûrî Babegûrgûr

Rêge çûlken hestine ser
pê
Wa espêkî spî yal sûr
Le pêdeştî Kerkûk ewe
Ehîlênê û bo êrê dê
Ey espekey
Tewêl marwî Germiyan
im
Ewey befr û gir û şepolî
nasîbê
Ewey şimşêrî birûske û
Ba û boranî kêwî dîbê
To enasê
Ey reşebay
Le paşko da xor siwar
kirdû
Ewey carê
Gûlale Sûrey çaw reşî
Rehîmawa û minalanî
Ser qoçke taşî Leylan û
Kêlgey birsi Dûzî dîbê
To enasê
Kobinewe û hestine ser
pê
Ser helbirin
Bazêk şelalî xwênawe û
Tozêkî tir bem naweda
Tê eperê
Ruwe û Qendîl
Be ser hewrazî şexte da
Nizm efrê
Heta egate ser lûtke û
Deçê lewê
Le pele xwênî "Nazim"
da
Be hêwaşî radekişê
Rêge çolken hestine
serpê
Ziryan givey win kirduwe
û
Boy egerê
Germiyan kûrey kawe ye
û çoş dirawe
Temaşaken
Herçî girdolkey pêdeştî
Leş cinrawe
Wekû dayîkanî wilatim
Binçikî qij û egrîcey
Gij û giyayan
Le milyan de aloskawe
Mame Rîşe
Ey pilingî çing be girî
Germiyan im
Beytî tazey tûhfey emroy
Kurdistan im
Le malanî gun be gundî
Helqirçawa
To qutîlkey ber heywan î
Dasî dirwêne û hetaw î
Ser banîjey zistanan î
Mange şew î,
Hêşûy rezî
Hajey çem û
Wije wijî daristan î
Agirî Şiwan î
Wekû baran, wekû kanî
Wek dexl û dan
Xoşewîst î
To kûrî Babegûrgûrî
Dastenêkî sedey bîst î.

**Şêrko BÊKES**



# Mame Rîşe

*Şehîdêkî nemirî gelekemane*

Mame Rîşe yan Helokey Germiyan roleyekî ciwamêr û pêşmergeyekî mêrxasî gelekeman bû. Nawî tewawî "Necmeddîn Şikur" bû û le salî 1952 da, le gundî Talebanî nêzîk be Şarî Çemçemal le dayîk bûwe, ewîş weku zorbey minalanî gelekey be hejarî û zehmetkêşî gewre bûwe. Pêm waye karî serekî em kure gundnişîney Kurdiman cutyarî û şiwanî û gawanî bûwe, nexwêndewar bû belam diwatir bû be qutabiyekî jîr û hêjay qûtabxaney Kurdayetî, qûtabiyek ke cêgey rêz û xoşewîstî û aferînî hemû gelî Kurd bêt. Mame Rîşe le destpêkî salanî hefta da, bo beşdarî le şerekanî Felestîn da xo amade dekat û deçê lewê şan be şanî pêşmerge. Felestîniyekan beşdarî xebatî azadîxwazaney gelî Felestîn dekat. Salî 1974 debête pêşmerge û beşdarî şorişî "Eylul" î neteweyî gelî Kurd dekat. Herçende em heloyeman ew beşdariyaney hebûwe, bo têkoşanî azadîxwazane û çote derewey Kurdistanîş belam ew diwatir û le şorişî niwêy gelî Kurd, le Başûr heqî xoy diraye û hate naskirdin.

### ŞERVANÎ Û CIWAMÊRÎ MAM RÎŞE

Pêştir witman Mame Rîşe beşdarî şerî Felestiniyan û şorişî 1974 gelekeşî kirdibû, belam ew ke le salî 1979 bû be pêşmerge, le salî 1980 be diwawe wirde wirde nasra be corêk cêgey xoy le dil û derunî zehmetkêşan û gundnişînekanî Kurdistan da kirdibowe ke diwatir, gelî Iraq be Kurd û Erebewe em mirove mêrxaseyan nasî... Azayetî û ciwamêrî em heloye be pênûs nanûsrêt û be ziman wesif nakrêt, pêm waye, şerekanî germiyan û Kerkûk û Çemçemal hwd. em qaremane gewahî, em rastiyen. Şerî gundî "Hemik"î salî 1981 le deverî Germiyan, dekrê be tenha bibête hewênî roman, fîlm û şanoyî hwd. şerî gundî Hemik şerêkî naberanberî nêwan, pêşmerge û orduy zebelahî hikumetî Bexdad bû. 10–15 pêşmerge beranber be hezaran esker û caş û tank û top û firoke le şer da bûn, le şerêkî şew û rojî da ke gundî Hemik darî be ser perduyewe nema û hemûy text, bû ziyanî dujmin de car beranber be ziyanî pêşmerge bû.

Le şerî jaley berderben da ke komelêk pêşmerge le layen dujmin ewe û behêzêkî zor gemaro dirabûn, Mame Rîşe le gundî Taleban ewe firyayan kewt û gemarokey şikand û rizgaryanî kird. Bêguman em firyakewtine Kurd, witenî her be dem xoşe, çunke mawey nêwan herdu gundî Taleban û jale deyan katjimêre ke Mame Rîşe, û hawrêkanî be çend katjimêrêk û be pê biriyan û yekser kewtine şerêkî sextewe û be maweyekî kem, pêşmergekanî naw gudiyan rizgar kird. Egêrinewe katêk berew şerî gundî Bêtwate deçûn. Mame Rîşe çend hawrêyekê le hêzeke ciyadekatewe û bewanî tir delê êwe be otomobîl biron, ême be pê deçîn, çunke zor peleyîn ..Em Heloye weku askêk rêy dekerd û berd be berd, dol be dolî xakekey şareza bû. Qaremanêtî û azayî û ciwamêrî Mame Rîşe çendî leser binûsrê kem e û gelê heqî le ser man heye, belam bedaxewe ta ku êsta weku pêwîst awirî lênedrawetewe tenya şayîrî gewre Şerko Bêkes nebêt ke be helbestêkî ciwan û nemir em şehîdeş be ser kirdotewe, boye êmeş le gel em nusîne da pêşkeşî xwêndewaranî rojnamey Welatî dekeyn.

### REWŞ Û HELSUKEWTÎ MAME RÎŞE

Mame Rîşe çendê le ber azayî û ciwamêrî xoşewîst bû, du ewendeş le ber helmsûkewt û dawên pakî xoşewîst bû. Helgîz xoy le kes be giwretir nedebînî û fermanî be ser kes da nedekird, hemîşe xoy weku pêşmergekî asayî nîşan deda, belam le katî şer û lêqewman da serkirdeyekî mezin û cêgay bawerî hemwan bû. Pêm waye ew daxey ke şehîd bûnî Mame Rîşe kirdiye dilî hejaran û gundiyanî Kurdistanewe, daxî kem serkirde wa be siwê bûwe, be corêk paş şehîdbûnî le hemû malêkî nîştimanperwer da şîn û pirse bû, çunke ew bibiwe kurî hemû hejaran û nîştimanperweranî gelekey, be rastî şehîdbûnî ew be tenya cîgerî dayîk û bawikî nesutan, belku cigerî hemû Kurdistan boy suta.

### ŞEHÎDBÛNÎ

Rojî 25.1.1985 be şêweyekî zor trajîdiyayane û le encamî planêkî çepel, û gilaw da em kure ciwamêrey Kurdistan kewte naw dawî napakane we û şehîd kira.

Bi rastî şehîdbûnî Mame Rîşe, ziyanêkî mezin bû boye, zû dilî Kurdistanekey boy daxurpa û be xêrayî bruske, be seranserî Kurdistan da em hewale cerig bire bilaw bûwe we. Paştir " le toley Mame Rîşe û hawrêkanî da "zor şit kira û zor çalakî qaremanane encam dira belam kar le kar tiraza bû, çî bikraye beranbir be penceyekî em Heloye nebû, boye ewsa û êstaş her ewende dewitrê ke bilêyn.

Hezaran hezar selaw le giyanî em

Helo şehîde û hemû şehîdanî rêgay azadî Kurdistan.

**Sirwan REŞÎD**



## EGÎT

***Roj ji rojeka bibarê***
***Hat Bîst û Heştê Adarê***
***Ewr û ezman hatin xwarê***
***Li ser Çiyayê Gebarê***

***Wî tivinga xwe bilanî***
***Şerê giran li ber xwe danî***
***Bo azadî û serxwebûnê***
***Bi şoreşê bawer anî***

***Egîd û mêrxasê Kurda***
***Li ber dijmin serî bilda***
***Ew tu carî ji bîr nabe***
***Daw û doza Mazlûm bilda***

***Xwe berada deşt û çola***
***Ji bo rake beyf û tola***
***Bi bêrs û kîn çû ser dijmin***
***Dil û gurçik bûn ji pola***

***Wî pilingê serê çiyan***
***Xwe li dijmin kire xuyan***
***Piştî ku ew şebîd dibû***
***Gelê wî rabû ser piyan***

***Ew bû Egîdê egîda***
***Bi serbilindî serî da***
***Li pêşya karwan dimeşe***
***Hildigire Ala Şebîda***

***Şêrê Kurda şoreşger bû***
***Mêr û jîr û serleşker bû***
***Şoreş gelek nêzîk didît***
***Ji gelê xwe bi bawer bû***

***Ji xwe re têkoşîn kiribû kar***
***Bûbû êşa dilê neyar***
***Wê bi jîn be û tim bebe***
***Ew şoreşgerê fedakar***

**Adar JIYAN**

*Di 8 saliya şehîdbûna xwe de Mahsum Korkmaz:*

# ‘Bipirsin min ji dîrokê min bibînin li şoreşê’

***Em dikarin bibêjin di têkoşîna ku îro ewqasî li pêş ketiye de bandora yek ji van kesan jî, şehîdê mezin Egît e. Mirov tu carî Egît û têkoşîna Egît, nikare ji Serok, Mazlum, Xeyrî, Hakî, Kemal û hwd. pêşengên ku şehîd ketine veqetîne. Weke çawa ku her bûyer di dema xwe de tê şîrovekirin rastiya xwe dibîne, kes jî, di dema xwe de bê şîrovekirin wê li ser rastiya xwe rûnê.***

Her şoreş, li gorî şertên xwe bingeha xwe amade dike. Li welatên pir lipaşmayî ev şertên han hîn bêhtir zehmet e. Ev zehmetbûn şoreşgerîtiyê jî zehmettir dike. Jixwe şoreşgerîtî li her welatî zehmet e! Lê ev rastiya hanê li welatê me, bi çend qata zêdetir e. Ji ber ku ne weke welatên din, li xwe xwedî derdikeve. Welatê me ber bi tunebûnê ve, ber bi windabûnê ve diçû. Di nava van şertan de, helbet wê şoreşa vî welatî jî, li gorî hin kesan tevlîhev û dijwarbe. Ji aliyekî ve êrîşên dewletên dagirker û ji aliyekî şerên birakujiyê, hemûyan, nîşana welatekî ku hêviyê bide mirov ji holê rakiribûn.

Di demeke bêhêvî de, bi dîtineke hemdemî, incax ev bêhêvîtî dikarîbû ji holê rabûya. Wê bêhêvîtiyê jî veguherîneke mezin dixwest. Di vê veguherînê de çawa bandora rêxistinan hebe, wisa jî bandora kesan heye.

Em dikarin bibêjin di têkoşîna ku îro ewqasî li pêş ketiye de bandora yek ji van kesan jî, şehîdê mezin Egît e.

Mirov tu carî Egît û têkoşîna Egît, nikare ji Serok, Mazlum, Xeyrî, Haki, Kemal û hwd. pêşengên ku şehîd ketine veqetîne. Weke çawa ku her bûyer di dema xwe de bê şîrovekirin rastiya xwe dibîne, kesê ku jî, di dema xwe de bê şîrovekirin wê li ser rastiya xwe rûnê.

Ev hefte, dîsa salvegera şehîdbûna Egît e. Bi vê wateyê, em bi kurtî dixwazin li ser Egît û dema ku tê de têkoşîn daye rawestin.


Egît bi destpêka têkoşîna çekdarî ya 84'an û pê ve, çek û rextên xwe ta ku şehîd ket, ji ser bejna xwe dernexist! Egît di wê bîr û baweriyê de bû ku têkoşîna rizgariya neteweyî, ne bi çekan be qet bi ser nakeve û neteweya Kurd qet tu carî nikare tevgirêdanên xwe çêbike. Ji bo ku gelê Kurd bikaribe tevgirêdanên xwe çêbike, divê têkoşîneke çekdarî bi konevanî bimeşîne. Ev têkoşîna çekdarî jî, ji bo ku pêşiya tevgirêdanên civakî veke girînge. Egît hemû kar û xebatên xwe, serleşkeriya xwe, bi vê dîtinê dimeşand. Duristî û fedekariya wî rastdîtinên wî, di demeke kurt de ew kir Serleşkerê artêşê. Ev duristî û fedekariya wî, li herêmên ku lê dixebitî dibû bingeheke mezin ji bo tevgirêdanên şoreşê. Ger mirov bala xwe bidê, cihê ku Egît lê xebitiye, ji hemû herêman qewîntir e û bi bingehtir e. Jixwe ev rastiya wî ye ku ew xistine nava pêşengên şoreşê û şehîdên nemir. Ev rastiya wî ye ku ji helbest, muzîk, çîrok, nivîs û têkoşînê re bûye çavkanî. Bi dehan helbest li ser wî hatine çêkirin yek ji yekê xweştir, lê yek ji yekê kêmtir e. Ji bo ku Egît bînin zimên, “pirsa min bikin ji dîrokê, min bigerin li şoreşê” rûmeta Egît hebekî tîne ber çavan.

Egît ne tenê şoreşgerekî Kurd e. Ew şoreşgerekî navneteweyî ye. Li Filîstînê, Lubnanê, li Kurdistana başûr û bakur, li ku pêwistbûya ew li wir bû ta ku şehîd ket.

Em Kurd îro bi van şehîdên xwe yên şoreşê serbilind in. Ev serbilindî carna jî, dilê mirov dişewitîne; me çi Egît winda kirin û winda dikin. Der heqê wan de gava ku mirov tiştekî dinivîsîne jî, rengê nivîsa mirov weke rengê xwîna wan e!

Ji bo ku xwîna wan zêde neherike, divê em jî bi xwîna xwe li wan xwedî derkevin. Bîranîna şehîdên şoreşê wê bibe roja şoreşa me.

**Î. XORT**



# Serxwebûn çareya her tiştî ye

Koçberî di dirêjaya dîrokê de bajar bi bajar, hin deveran ji bo deverên pêtir bajêrvanî lê û berew cihên pêşdeçûyî û rewşa aboriya geştir çêbûne, ew jî ji egera pir sedeman. Ev diyareka civakî metirsiyek (xeterek) mezin e û encamên xwe yên nebaş di her aliyê jiyanê de li ser civakê hene.

Gelê Kurd nesîbê wî çi caran kêm nebûye û dirêjiya dîroka xwe tuşî koçberiyan bûye. Di çerxê hevdem de ji ber ku miletê Kurd pir di bin zilm û zoriya dagirkeran de naliye. Li hember wê zilm û zoriyê, bizavên neteweyî û serhildanên Kurdan çêbûne, dijmin û neyarên gelê Kurd bersiva wan serhildana bi agir û hesin daye, Kurd bêçar mane û tenê rev û koçberî çareya xwe ya dawî ditine piştî şikestin û têkçûna serhildanên wan, nimûneyên berbiçav û li bîr jî, koçberiyên Kurdên başûrê Kurdistanê û heya niha ji hin ji wan li kampên Silopî, Diyarbekir û Mêrdîn... hin ji wan li Rojhilat dimînin. Ger em rewşa Kurdistanê vekolin û riealîstiya wî şîrove bikin û li ber çav deynin, Kurdistan wekî welatek parçekirî, siyaseta dagirkeran, ferizkirina rewşa civakî û aborî tev egerên koçberiya hezaran û heya digehe milyonan ji xelkê Kurdistanê.

Ji aliyê siyasî ve, teror, zilm, zorî, qetlîamên mezin, dûrxistina bi zorê, mal şewitandin, gund wêrankirin û tengkirina nefesa gelê Kurd li tevaya Kurdistanê, her wisa binçavkirina şoreşgeran û pêkutiya dijminan ji bo nehiştina xwedî hizr û bîran û dûrxistina xwedî şiyan û îmkanan, zêdeyî vê çendê ji serbîrîn û kîpkirina serhildanan ji aliyê faşîzm û dagirkerên Kurdistanê ve faktorê civakî ji bandora xwe ya mezin heye, ew jî nebûna tenahî û aştiyê, derketina rewşên siyasî û gûherînên wan, guvaştina xwedî fikir û şiyanan, ferîzkirina fikrên faşîst û dîktatorî... hwd. Em ji bîr nekin, ji sedema van rewşan bi hezaran xort û lawên Kurdan derbederî cîhanê bûn, piştî wergerana leşkerî ya faşîst li Tirkiyeyê, li 12 Eylol sala 1980'an.



*Di van salên dawî de zêdeyî 500 mal ji bajarên Silopî, Şirnex, Ûludere û Hekarî (Cûlemêrgê) koçberî bajarê Zaxo û deverên din ên Behdînan bûyîne. Piştî gundên wan ji aliyê Artêşa Tirk a hov ve hatin şewitandin, ewên dûrî sînoran gund gund, bajêr bajêr koçber dibin. Her wiha li Rojhelatê jî ev halê Kurdane mîna pezê derdora wî girtî be û gur ketibe navde Bi tenê Kurd cih guhertine. Ji bindestên Tirkan ketine yê Ereban, ji yê wan jî ketine bindestê Farisan.*

Ji hêla aborî ve ji egera siyaseta dagirkeran û mêtina xêr û bêrên Kurdistanê, peydabûna hejarî, birçîbûn û xwarina mafê gel û dûrxistina wan ji dezgehan û rêbirina (îdareyên) dewletê, jêrdestkirina milk û emlakên Kurdan û koçberkirina bi zorê û cihkirina nîjadên din mîna Tirk, Ereb, Faris li cih warên wan faktorên mezin in ku, gelê me neçarî koçberiyê kirine û dikin.

Di van salên dawî de zêdeyî 500 mal ji bajarên Silopî, Şirnex, Gever û Hekarî (Culemêrgê) koçberî bajarê Zaxo û deverên din ên Behdînan bûyîne. Piştî gundên wan ji aliyê artêşa Tirk a hov ve hatin şewitandin, ewên dûrî sînoran gund gund, bajêr bajêr koçber dibin. Her wiha li Rojhelatê jî ev halê Kurdan e mîna pezê derdora wî girtî be û gur ketibe navê. Bi tenê Kurd cih guhertine. Ji bindestên Tirkan ketine yê Ereban, ji yê wan jî ketine bindestê Farisan. Ji gundê Bêmiradan bo gundê Bextreşan. Gelo ma ev çare ne? Em bêjin li Bakur û Rojhilat ji ber zilma dagirkeran, erê li Başûr çima?

Va ye sê sal in her roj ref bi ref Kurdên Başûr (Kurdistanan Azad) bi cih dihêlin û rû dikin derveyî welêt, her roj 8 kes bi resmî û bi pesepor tên sexte û reşwetkirina berpirsên hikûmeta herêmê, ji jiyana ne tenahî, berew jiyana koletî û windabûnê direvin.

Zêdeyê wan jî mîna keriyên pezî bi rêkên qeçaxî ku şerefa (Intîke) yiyê distandin (Ticarên derbakirina mirovan ji wan kesên ku bi qeçaxî derbaz dikirin digotên Intîke). Em dikarin bêjin piştî Serhildana 91'an, li Başûr û heya niha zêdeyî 20000 kesan ji Kurdistanê reviyane, tev jî xwedî şihade û şiyan û teknik in. Pirsiyar dide pêş. Ji Başûr çima koçberî? Bersiv jî bila ji hikûmeta herêmê re be, lê belê bila berpirsên wê ezmanê xwe li dora devê xwe negerînin û bêjin (Ême hikûmetêkî savane û wezî abûrî...) Çimkî çi sava namînin heta heta şîr bixûn, tev du sê sal in êdî bi linga rê diçin!.. Gelo ji bo rawestandina koçberiyê çare çi ne?

**BEHLOLÎ**

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | | | | | ■ | |
| 2 | | | ■ | | | ■ | | | | ■ | | |
| 3 | | | | | ■ | | | ■ | | | | |
| 4 | | | | ■ | | | | | ■ | | | |
| 5 | | | ■ | | | ■ | ■ | | | | | |
| 6 | | | | | | | | | | | | |
| 7 | | ■ | | | | | | | | | | |
| 8 | | ■ | | | ■ | | ■ | | | | | |
| 9 | ■ | | | ■ | | | | | | | | |
| 10 | | | | | ■ | | | ■ | | | | |



**Çeperast:** 1–Helbestvanê mezin ê Fransî di navbera 1895–1952'yan de jiyaye. Ji derî helbestvaniyê gelek helbestên biyanî wergerandiye ser zimanê Fransî. Dema Almanyaya Hîtler girte ser Fransayê bi awayekî aktîf li dijî faşîzmê şer kir. Çend pirtûkên wî: Herikîna xwezayê, Strana bêkêmasî, Helbestên polîtîk. Bi helbesta xwe ya bi navê "Azadî" pirr tê nasîn. Di xaçepirsê de wêneyê wî tê dîtin. 2–Beyreq/ Îşaret/ Di laşê mirov û sewalan de cihê di navbera ser û bedenê de/ Cînavka yekemîn a yekhejmar 3–Îhtîmala talûkeyê/ Ji agir dertê/ Zarokê(a) kur an jî keça mirov 4–Navgîneke siwareyên bi motor/ Navê bajarekî Fransayê/ Ol (berevajî) 5–Kûçik/ Notayek (berevajî)/ Tiştê bi evînê ve girêdayî 6–Rengdêra trajediyê 7–Mîladî 8–Yan 9–Sond/ Fermanek 10–Cureyekî şanogeriyê/ Dijwateyê kevin

**Serejêr:** 1–Muhefezekirin 2–Kesê ku alîkariyê dike/ Mam, birayê bavê mirov 3–Rêxistineke Naziyan/ Serbestî 4–Xîtik, ava ku ji poz tê/ Sîxur 5–Cînavka yekemîn a pirhejmar/ Di arenayê de ev peyv tê gotin 6–Kurtenivîsa doktor/ Menzere, panorama 7–Terz, teşe, stîl, awa/ Navê rojekê/ Pêşiya serê mirovan 8–Germaya laşê mirov (berevajî)/ Unîte, şax 9–Cureyekî don 10–Cephe 11–Eşq 12–Navê oleke ku hin Kurd pê bawerî anîne.

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Leon Tolstoy 2–Êl/ Olan/ Zer 3–Deman/ Homa 4–Aqût/ Ronay 5–Ne/ Enedol 6–Dê/ Êş 7–Savar/ Ra 8–Araq/ Don 9–Rimat 10–Av/ Loma

**Serejêr:** 1–Lêdan/ Sara 2–Eleqedar 3–Mû/ Êvar 4–Ate/ Aqil 5–Ton/ Nêr/ To 6–Ol/ Beş/ Dam 7–Laz/ Roma 8–Sn/ Roman 9–Hol 10–Ozon 11–Yeman 12–Ray


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |

# Firto û Zirto



Carekê rovîkî sorik û şêrek li daristanekê rastî hev hatin, li hal û demên hev pirsiyan. Pişt re rovî ji şêr re got: "Birayê şêr tu li nêçîra xwe digerî û ez jî li nêçîra xwe digerim. Ka ez û tu bi hev re li nêçîrê bigerin. Tu şêr î û tu dikarî hemû nêçîran bikî. Ez roviyê belengaz nikarim her nêçîrê bikim, lê dikarim her taştê û firavînê amade bikim û pêşkêşî te bikim. Bi ya min tu yê nêçîrê bikî, ezê jî xwarinê çêkim û pêşkêşî te bikim. Emê bi hev re bixwîn." Şêr dema li rovî guhdarî kir, hin çiv dan xwe û got: "Gelek baş e, ev pêşniyara te roviyê reben, qet nebe tu yê jî di saya min de qopan bixwî." Rovî û şêr bi hev re rabûn û çûn. Lingê rovî ji şabûnê negihîşt erdê. Rojekê dudiyan nêçir kirin û anîn di hundirê şikeftekê de veşartin. Dema çavên rovî li nêçîrê ket, hişê wî ji serê wî çû, nêçîr gelek bû. Biryar da ku, xapekê li şerê gernas bike û nêçîrê tev bi xwe re bibe.

Rovî planek çêkir, çû werîsekî sitûr anî û li pêşiya şêrê gernas danî û got: "Seydayê şêr berî ku ji te re şîvê çêbikim, ez dixwazim pirsekê ji te bikim. Ger tu rê bidî min?" Şêr bi dengekî bilind got: "Fermo, fermo rebeno, ma qey tu yê çi pirsê bikî." Rabû ser xwe û bi tirs got: "Seydayê şêr dibêjin ku, ewqas tu xurt î, hêza te li hemû cenawiran dibe, ez jî wisa difikirim, tu heke li ber xwe çi qeyd û bendan bibînî tuyê biqetînî, lê dîsa ez dixwazim hêza te bi çavên xwe bibînim." Şêr hin çalim dan xwe û got: "Ma qey te nizanibû ez şahê lawiran im, tu hêz nikarin li pêşiya min rawestin? Rebeno tu çi dixwazî ez ji te re pêk bînim." Rovî got: "Seyda, ez dixwazim te bi vî werîsî girê bidim, hele ka tu dikarî biqetînî, yan nikarî." Şêr kenê xwe kir û pêşniyara wî pejirand. Rovî anî werîs çar–pênc caran li dest û piyên şêr girê dan, şêr çend caran zor da xwe ku biqetîne, nebû, rovî xwest ku, baweriya xwe pê bîne ku şêr nikariye wêris biqetîne got: "Tu bi min tinazên xwe dikî, ma tu çawa nikarî vî werîsî biqetînî?!" Şêr hîn zor da xwe, lê werîs neqetiya:

Dema rovî baş têgihîşt ku şêr nikare wêris biqetîne, çû nêçîra xwe anî, da ber xwe û xwar. Heke dilê wî xwest çend hestî avêtin ber şêr heke nexwest ew jî neavêtinê.

Piştî ku zikê xwe têr kir, xatirê xwe ji şêr xwest, şêr li ber rovî gerî, got: "Min azad bike."

Rovî guhê xwe nedayê. Berî ku here şêr ji rovî pirsî; got: "Çûnê tuyê herî, qet nabêje min tu kî yî?" Rovî got: "Ez Firto me." Şêr di wî halî de hişt û çû. Şêr di vî halî perîşan de li çareyekê difirikirî, dît ku tiştekî serê xwe ji qulekê derxist, dîsa bi şûn ve kişand. Şêr ev dît, got: "Tu kî yî?" Mişkek bû ew, ji qula xwe derket halê şêr dît, dilê wî pê şewitî, xwest ku şêr rizgar bike û ew daxwaza xwe jî şêr re got. Şêr jê bawer nekir, xeyîdî got: "Tu bi min henekan dikî." Lê dît ku xeynî vê jî tu rê li ber tune ne, pêşniyara wî pejirand. Mişk ket ser wêris, bi diranan werîs qetand û bi lez revî qula xwe. Şêr rabû ser xwe got: "Hele were der tu kî yî?" Mişk got: "Tu yê min bixwî." Şêr got: "Na te naxwim, ka bibêje tu kî yî?" Mişk derket û xwe da nasîn: "Ez Zirto me." Şêr got: "Welatê ku Firto mirovan bide girtin, Zirto jî berde, ez lê namînim." Welatê xwe berda û çû.

**M. HEMO**




## Gelî zarokan!

*Ev rûpel ya we ye, ji bo we tê hazirkirin. Lewma çi xebata ji destê we derketibe hûn dikarin ji me re bişînin. Emê berhemên we di vê rûpelê de biweşînin. Rûpel rûpela we ye. Xemilandina wê li hêviya we ye.*

# Ji bo azadiyê agir bi bedena xwe xistin

*Gelê Kurd ji bo rizgariya xwe û ji bo mafên xwe yên xwezayî, wek her salên borî cejna xwe ya pîroz, ya neteweyî li her derê Ewrûpayê û hin deverên dinyayê pîroz kirin. Gelê Kurd Newroza xwe li Kurdistanê, li ser daxwaza PKK'ê di malê xwe de û li Ewrûpayê jî bi meş û dirûşmeyan ve pîroz kirin. Di vê pîrozkirinê de jî ciwanên gelê Kurd xwe şewitandin û bi agirê Newrozê neheqiya serdestan protesto kirin.*

Newroza 1994'an dîsa bi xwîna pakrewanan ve xemilî, xurt û geş bû. Li hin deveran bi serhildanan, hin deveran bi protestoyan û hin deveran jî bi xwe şewitandinan ve hate pîrozkirin. Ev agir, ev agirê venemir, ev agirê di dilan de veşartî, ev agirê kan û avzêma çol û qeydan şikandinê...

Ev agirê ku ji nû ve dibe jîndar û hêşîn dibe, îsal dîsa di dilên gelê Kurd de bi heybet gul veda û agirê rojê xiste mala şermê. Ew roja ku ji serdest û zordaran re her tim dertê û li wan ronahiyê dike. Newroza gelê bindest dîsa bi agir, li ser laş û meytên keçik û xortan teyîsî û şax veda. Dîsa agir bi germahiya mirovan ve hişyar bû, êgir dîsa nasiya xwe bi dil û giyanên pakrewanan re danî, agir dîsa bû hevalê mirovahiyê. Her wekî êgir keser û axîna gelê Kurd û Kurdistanê nas kir, agir bi êşîna bindestan hesiya. Îsal dîsa meşheleyên Newrozê însan bûn, dîsa agir bû evîndarê keçikên agirhez, ew keçikên li derveyî welêt, lê bi jana welêt tije... Xwe avêtine hembêza agirên pîroz. Ew û agir tev dîlan kirin û Newroza gelê Kurd pîroz kirin. Êgir, bilî navê Zekiyeyê, Reşanê û hwd. navê Bêrîvan û Bedriyeyê jî nas kir. Paşê ji bo Newrozê şer dest pê kir, bajarê Stenbolê şahid e. Serhildan ji dil dihat, ew xortên welatekî bindest bûn û wan rizgarî dixwest. Agirê xwe vêxistin, dîlana xwe girtin, belavok belav kirin, ala xwe ba kirin û dîrûşmeyên xwe avêtin... Şer kirin, reviyan wek şêr û piling, bi dilê askên çiyayê di bin agirê bombeyan de perçiqî.

Vedat Han Gülşenoğlu bû wek lehengên qerneyên kevnare yên welatê xeybê û gernasiyê, wî Newroz bi deng û bi serhildan pîroz kir, kolan û kuçe şahid in. Em nagirîn ey xortê dilçiya, ey peyva Newrozê. Em bi kuştina te naêşin, lewre ew rê li pêşiya me hemûyan e. Bila ev agir bibe dojeha me, bila ev roj bibe destpêka mirina me. Her wekî em di vê dojehê de ber bi rizgariyê ve diçin. Ey şêrê revbinewroz, ey birûska Newroza pîroz, ey zarokê çavbiagir, ey ciwanê kenadar, xortê Kurdistanê Wedat Xan, em we ji bîr ve nakin...Ey Wedat Xan, here ba Bêrîvanê siwarî kêleka agirê Newrozê bibe. Bila Bêrîvan tîra nêrîna xwe ve fîşenga Dehakên hemdem ji stûyên te derxîne. Paşê herine ba Zekiye û Reşanê, paşê bi mêhrîcan bikevine rê werin Kurdistanê, herin Amedê û serdanekê li Kawayê Hemdem Mazlum Doğan bidin. Dû re bibine wek sotikên pirûskê û xwe ji Newrozên wê bên re veşêrin, wek evîndarekî dilkurdistan...



Di Newroza 1994'an de gelek kesan xwe şewitandin û bi agir zilm protesto kirin.

*Newroz*
*Newroz*
*Ev agirê di dil û hinavên*
*min de*
*gustîl kirî, hevoka bi*
*peyîvên agir avakirî...*
*Ji min re bayê bihara*
*kenê Wedat Xan û*
*kesera çivîkên qefesê*
*yên ku bi hezar nefes*
*Newroz*
*dûrî me ne, yên ku xwe*
*xistin meşhele û*
*xwe dilopî okyanûsa agir*
*kirin, yên ku*
*navê wan Bêrîvan û*
*Bedriye ne*
*nîşanî min bide. Ezê*
*wana ji zeviya dilê*
*xwe re*
*bikime gul, ji bihara welêt*
*re hilma jiyanê...*

*Newroz*
*Newroz*
*Nema ji bîr ve bike*
*destana xortên*
*Kurdistanê li*
*kolanên bajarên biyan*
*Bi agirê xwe ve êşa*
*birînên wan bikuje,*
*kewa birînan bişkîne,*
*agirê xwe bixe hetwan*
*li hember kambaxiya*
*fişengan,*
*bibe jandar, bibe kan û*
*avzêma*
*jiyanê Newroz...*
*Bigire bi destê Wedat*
*Xan*
*ew xortê şervan, berhev*
*bike xuliya laşê*
*Zekiyeyê, Reşanê û*
*Bêrîvanê*
*hilde li rûçikên xwe û*
*dêmên welêt bide*
*Xulya wan ji xwe re bike*
*"Evdilheyat",*
*li nav pelên alava xwe de*
*wek mezinahiya wan*
*gulên agir, yên ji bo*
*cejna pîroz biafirîne*
*Bi nalîn û êşîna van*
*pakrewanan ve*
*gazî hemû agiran bike*
*ey Newroz...*
*Dengê Mazlum Doğan ji*
*xwe re têxe mey û bilûr,*
*bila bi banga Kawayê*
*Hemdem ve*
*hemû agir serî hildin,*
*da ku*
*roj were tu cîhanê ji*
*tarîtiyê rizgar bikî*
*Ronahiyê bi lêpên miro–*
*vahiyê ve bixemilînî...*

*Newroz*
*Newroz*
*Em Wedat Xan û*
*Bêrîvanê û hemû*
*şehîdan*
*bi stran û dîlokên te*
*diyarî axa welêt dikin...*
*Bira hemû Newroz*
*bi şûrê nêrîna Wedat*
*Xan û*
*agirê bedena Bêrîvanê*
*ve*
*pîroz bibin.*

**M. Zahîr KAYAN**



Li Frankfurtê gelê Kurd Newroz bi wateyeke giran pîroz kirin.


welat

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
- Nûnerên Rojhilata Navîn (Ortadoğu Temsilcileri) Fener Rojbiyanî – Jan Dost
- Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tigrîs
- Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık